Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1391 | 5-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Cara yekem e ku Dibistana Pilingên Taekwondo tevlî kûpa Sûrî ya netewî dibin

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Rahênerê Dibistana Pilingên Taekwondo ya Navdewletî ya navenda Dêrikê Xelîl Hesam diyar kir ku armanca tevlîbûna wan ji kûpa Sûriyê ya netewî re, ew bû ku ji her kesî re isbat bikin ku gelê Kurd her tim serkeftî ye.**





15 Sali in ku Dibistana Pilingên Taekwondo tevlî kûpa Sûriyê nebûye û di bin ala rêjîma Bassê de nelîstuye. Piştî ku rêjîma Baas rûxiya û nakokiyên siyasî kêm bûn êdî tîma Pilingên Taekwondo berê xwe da Şamê û tevlî kûpa Sûriyê ya netewî bû. Ji tevahî Sûriyê 210 lîstikvan tevlî bûn û ji wan 30 ji Dibistana Pilingên Taekwondo bûn. Di derbarê tevlîbûna Kûpa Sûriyê a Netewî, Rahênerê Dibistana Pilingên Taekwondo ya Navdewletî ya navenda Dêrikê Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

**'Baweriya me bi tîma me dihat'**

Xelîl Hesam diyar kir ku Dibistana Pilingên Taekwondo wekî yekîtiya Tayekowndo çêkiriye û tê de du navend li Hesekê , navndek Dêrik, yek Qamişlo û yek li Amûdê, hene û wiha domand: "Di sîstema me de kesê ku kembera wî ya herî bilind be ew dibe serkêşê me, di her navendeke me de 3 rahênerên jin jî hene ku ew jî kesan fêrî taekwondo dikin. Ji bajarê Dêrikê ez rahêner(Kaptên) bûm û 7 lîstikvanên jin tevlî vê kûpayê bûn. Ev kûpaya netewî taybet bi jinan bû, ew ji sê beşan pêkdihat, beşek temenê wan di bin 9 salî re, ya duyem di bin 14 salî re û ya sêyem di bin 16 salî re bûn. Em li jiderveyî Sûriyê tevlî gelek kûpayan bûne. Wekî; Malîziya, Urdin, Libnan, Qeter û Îmaratê. Lê vê carê daxwazname ji me re hat ku em tevlî kûpa Sûrî bibin û li ser wî esasî me xwe amade kir û em tevlî bûn. Em bi xwe bawerbûn ji ber ku me dizanî hêza tîmên me ya serkeftinê heye. Ji xwe herêma me ji salên 1990'î ve di Taekwnndo de li ser asta Sûrî yekem e."

**Astengiyên ku rastî tîma Pilingên Taekwondo hatin**

Hesam bal kişand ser zehmetiyên ku derket pêşberî wan û wiha got: "Hin kes di yekîtiya werzîşê ya Sûriyê de ne û hîn zihniyeta wan ya Bassê ye. Ji xwe asta me yekem bû, ne ya sêyem bû eger edalet hebûya. Pêwîst bû me 6 mîdaliyên zêr bi dest xistibaan lê mixabin ji bo zihniyeta û kîna ku di dilê wan de mafê me nedan me tenê me du mîdaliyên zêr bidest xistin. Berî ku em bilîzin wan mîdalî belav kiribûn û her dixwestin Kurdan bê par bihêlin, tevî ku ev kesê ku me birîn ne lîstikvanên nixbê ne jî, tenê me hijmarek lîstikvan birin da ku em ji wan re bidin xuyanî kirin ku gelê Kurd heye. Ji xwe du tîm hebûn tîmek ya kembera reş bû û tîmek ya kembera rengîn bû. Dema lîstikvanên kembera reş lîstin jî wan xapandin kirin, kesên kembera reş dilîze cilên wan hesasê iliktronî têde heye her cara ku lêdanê bixwe tê hisab kirin, lê kesê ku li dijî me dilîstin ew hesas ji cilên wan derxistibin da ku biser bikevin."

Hesam axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: "Komîteyê çend kes diyar kiribûn bêyî ku bilîzin û tevlî maçê bibin tenê ya maça dawiyê dilîstin li dijî tîmên me. Tevî vê yekê jî lîstikvana me ya bi navê Esînat Malik tîma kembera reş bû, tu kes mîna pîvana wê nebû, di sîstema taekwondo de dema kesek mîna pîvana te nebe yekser tu mîdaliya zêr bidest dixe, lê mixabin komîteyê di vir de lîstokên xwe yên qirêj bikar anîn ku kesek 10 kîloyan ji wê zêdetir bû anîn li dijî wê da ku bilîze, da ku em mîdaliya zêr bidest nexin û nebin tîmê duyem li ser asta Sûriyê."

**'Hêviyên me ji bo serkeftinên mezintir hene'**

Xelîl Hasam axaftina xwe wiha qedand: "Me du mîdaliyên zêr, 2 zîv û 9 bironz bidest xistin, piraniya kesên ku di navendên me de vê lîstokê dilîzin Kurd in û em bi rengê Kurdî çûbûn. Bi şêwazekî dispilîn û lihevhatî bûn her kesên ku ji derdora Sûriyê hatî kêfxweşiya xwe ji bo cil û bergên me û dispilîna me tanîn ziman. Armanca me ebû ku em jî cihê xwe di yekîtiya Sûrî de bigrin ne wek mêvan hercarî em herin û vegerin, ji ber ku dema gelê Kurd bilîzin mafê wan newê xwarin û encam bi edaletî derkevin. Piştî vê kûpa yê gelek mizgînî ji me re tên ku Master Ebdulezîz û hevjîna wî Dilyar Hisên ku ew jî kembera herî bilind a reş bidest xistiye ku wê bikevin Yekîtiya Şamê de û em ê jî bibin beşek ji avakirina taekwondo li vî welatî. Di dema pêş de em haziriyan dikin ku em tevlî kûpa jinên ku temenê wan ji 17 salî û jor de bibin û hêviyên me ew in ku em serkeftinên mezintir bidest bixin. Em spasiya herkesê ku bi me re bû alîkar dikim ku me karî em rengê xwe derxin û isbat bikin ku em her serkeftî ne."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ku tu nabî gul nebe stirî jî:**
- Eger qencî bi te nabe qene xirabiyê neke.

**Li kîjan çiyayî gur miriye:**
- Te ti caran qencî nedikirin; te çawa îro qencî kir?
(Ku yekî ti caran qencî nekiribin, dema carekê dike wisa jê re tê gotin. Bi vî awayî rexne lê t ê n kirin)

**Min dayê bi tetika, pey digerim bi pepika:**
- Min bi hêsanî dayê, niha li pey ketime nikarim bistînim.

**Nan da ber me çov da ser me:**
- Xirabiya bi me kirî ji qenciya bi me kirî pirtir e; qenciya xwe kir xirabî; ne li qenciya wî ne li xirabiya wî.

**Nan da ber me tajiya xwe da ser me:**
- Bi heman wateyê.

**Nanê me li ti kesî nayê:**
- Em qenciyê bi kê dikin dibe xirabî.

**Nanê me li xelkê nayê:**
- Bi heman wateyê.

**Ne bigire, ne berde:**
- Ne pir baş e ne pir xirab e.

**Ne li xêra te, ne li şerê te:**
- Xirabiyê neke, em qenciyê jî ji te naxwazin.

**Pê li xwîna me nekir:**
- Qencî bi me kir; em parastin; em qebûl kirin.

**Rake bi nanê xwe berde jîna xwe:**
- Qenciyê pê bike bila ew jî xirabiyê bi te bike.

**Riya rast berdaye:**
- Kiryarên wî tev şaş in; ji rê derketiye.

**Serek lê da/seriyek lê da/serek lê xist:**
- Çû serdana wî.

**Tu min bixwerîne, ezê jî te bialîsim:**
- Tu qenciyê bi min bikî ezê ji te pirtir bikim.

**Xwedê jê standiye:**
- Ji rê derketiye.

**Yek dîn yek dirist:**
- Dema yek xirab bike bila yê din çêke.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


**Sudoku: Bersiv 81**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 3 | 1 | 5 | 9 | 7 | 6 | 4 | 8 |
| 9 | 4 | 5 | 8 | 6 | 1 | 2 | 7 | 3 |
| 7 | 8 | 6 | 2 | 3 | 4 | 1 | 9 | 5 |
| 4 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 8 | 6 | 7 |
| 8 | 1 | 7 | 4 | 5 | 6 | 3 | 2 | 9 |
| 6 | 2 | 3 | 9 | 7 | 8 | 4 | 5 | 1 |
| 5 | 7 | 4 | 1 | 2 | 3 | 9 | 8 | 6 |
| 3 | 6 | 8 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 2 |
| 1 | 9 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 3 | 4 |

**Sudoku:Pirs 82**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | | | | | |
| | | 9 | | | | | 1 | 8 |
| | | | | 8 | 7 | 5 | 6 | |
| 5 | | | | | | | | |
| 1 | 7 | | 2 | | 8 | | 3 | 5 |
| | | | | | | | | 4 |
| | 8 | 2 | 5 | 4 | | | | |
| 6 | 3 | | | | | 4 | | |
| | | | | | 3 | 8 | 9 | 6 |

## Xerîb Hiso: Yekîtiya netewî pêdiviyeke stratejîk û çarenûsî ye



Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku niha di nav Kurdan de nakokiyên mezin tune ne, eger hebin jî pirsgirêkên biçûkin û bi rêya civînan tên çareserkirin, lê tiştê ku derdikeve pêş ku nîvê şandeya Kurdî ne bi îradeya xwe tevdigere û got, "Yekîtiya netewî pêdiviyeke stratîjîk û çarenûsî ye."**R-4**


## Rohat Xelîl: Ji bo xurtkirina têkiliyê jinan me serdana Başûrê Kurdistanê kir



**Seroka Desteya Jin a Cizîrê Rohat Xelîl da zanîn ku bi armanca xurtkirina têkiliyan di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê de, şandeyeke jin ji Rojavayê Kurdistanê serdana Başûrê Kurdistanê kir...R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1391 | 5-Tîrmeh-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Cotkarên ku zeviyên wan şewitîne banga qerebokirinê dikin



Cotkarên ji gundê Gir Sor yê girêdayî bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku ji ber şewata zeviyên wan, zerareke madî ya mezin gihaşt wan û gotin, "Zevî şewitîn û me zerareke pir mezin dît. Pêwîst e em bên qerebokirin."**R-8**

## Zindawerên çand û hunera Kurdî



Hunermend Îsa Berwarî ne tenê pêşkêşkarekî stran û awazan bû, lê belê ew parêzvanê bîra stranbêjiyê ya Kurdî bû, wî mîrata kevneşopî veguheste nifşan bêyî ku resenîya wê winda bike...**R-9**

# ÇARENÛSA GELÊN ÎRANÊ TÊKOŞÎNEKE HEVPAR DIXWAZE

Endamê Konseya Serokatiyê ya PJAK'ê Siyamend Mûînî diyar kir ku rêjîma Îranê piştî şerên dawî di qeyraneke kûr a aborî û siyasî re derbas dibe, ji ber wê divê gelên Îranê vê rewşa dîrokî ya hesas û xeternak baş fam bikin, pêwîst e ew nas bikin ku çarenûsa gelên bindest bi hev ve girêdayî ye û ew ê bikarbin bi hev re di civakeke azad û demokratîk de, jiyanek bi rûmet bijîn.**R-6**




## 'Divê gelê Başûrê Kurdistanê îro berî sibe hişyar bibe'



Kamîran Berwarî da zanîn ku veguherînên Rojhilata Navîn ên nûjen berî her tiştî metirsiyê li ser Kurdistanê çêdike û got, "Rewşa Başûrê Kurdistanê metirsîdar e, gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê ji vê rêveberiya heyî ne razî ye û divê gel îro berî sibe şiyar bibe û rabe ser piyan."**R-3**

Di roja me de girîngîdayîna zargotinê — İsyan Karadeniz R-2


Nameya êrişên dawî navbera ezmûna ewlehî û veguherînên li herêmê çi ye? — Idrîs Henan R-4


Şoreşa Edebiyata Komunal — Remezan Olçen R-9

# Rohat Xelîl; Ji bo xurtkirina têkiliyê jinan me serdana Başûrê Kurdistanê kir

Seroka Desteya Jin a Cizîrê Rohat Xelîl da zanîn ku bi armanca xurtkirina têkiliyan di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê de, şandeyeke jin ji Rojavayê Kurdistanê sardana Başûrê Kurdistanê kir û wiha got: "Me di hevdîtin û serdanên xwe de gelek mijarên têkildarî jinan li Rojava û Başûrê Kurdistanê nîqaş kir."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Di 28'ê Hizêranê de şandeyeke jinan ji Rojavayê Kurdistanê bi armanca xortkirina têkiliyan di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê de derbasî Başûrê Kurdistanê bûn. Di şandeya de Seroka Desteya Jin a Cizîrê Rohat Xelîl û Hevseroka Heyva Sor a Kurd Hediya Mihemed Ebdulah amade bûn. Herwiha piştî gelek serdan û hevdîtinan di 2'ê Tîrmehê de gera şandeyê li Başûrê Kurdistanê bi dawî bû.

Di derbarê sardana şandeya jinan yên Rojavayê Kurdistanê ji Başûrê Kurdustanê re Seroka Desteya Jin a Cizîrê Rohat Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

**'Bi armanca xurtkirina têkiliyan me serdanî Başûrê Kurdistana kir'**

Rohat Xelîl diyar kir ku di 28'ê Hizêranê de Şandeyeke jinan ji Rojavayê Kurdistanê derbasî Başûrê Kurdistanê bû û wiha got: "Bi armanca xurtkirina têkiliyan di navbera Rojavayê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê de me serdanî Başûrê Kurdistanê kir. Berî niha jî di plane me de hebû ku em weke şandeyeke jin ji Rojavayê Kurdistanê serdanî Başûrê Kurdistanê bikin, lê ji ber geşadanên dawî yên ku li Rojava, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hatine jiyan kirin hate taloqekirin. Lê piştî wê careke din derfet çêbû ku em di 28'ê Hizêranê de derbasî Başûrê Kurdistanê bûn.

Di çûyîna xwe de me sardana gelek cihan kir, me serdana Wezareta Kar û barên civakî kir, dihaman demê de em bi serok û cîgerê wê re rûniştin û nîqaşeke berfireh di navbera me de çêbû. Di berdewamiyê serdanê de, me serdanî Meclîsa bilind a jinê kir, ji ber ku kar û xebatê wan nêzî karê desteya jin li Rojavayê Kurdistanê ye. Ev hevdîtin bi armanca sûdwergirtina ji tecrûbeya herdu aliyan herwiha xortkirina têkiliyê di navber jinan de bû. Di nîqaşên me de hate diyar kirin ku Şoreşa Rojava Şoreşeke bi navûdenge herwiha ew bi vê yekê serbilindin û hate gotin ku divê destkeftiyên jinan li Rojava were parastin."

**'Me sîstem û tecrûbeya Rêveberiya Xweser di hevdîtinên xwe anîn ziman'**

Rohat Xelîl destnîşan kir ku wan li Başûrê Kurdistanê gelek serdan kirin û wiha pê de çû: "Me sîstem û tecrûbeya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hemû hevdîtin û serdanên xwe anîn zima, ew gelek pê bandor bûn û diyar kirin ku ew destkeftiyên gelek mezinin. Di haman çarçoveyê de me hevdîtin bi gerînendetiya giştî ya Gerînendetiya Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan û Malbatê Fînîk Şefîq Mihemed Emîn û Mîrala Sêvîn Tahir re kir. Di navbera me de gelek nîqaş li ser tundî li dijî jinê, rêyên xwe parastinê, piştgirya wan jinan û çiqas navendê wan hene hate kirin.

Di heman demê de me serdanî mala zarokan kir û serdana hin jinên ku tundî li ser wan hatiye kirin kir. Herwiha komxebatek hate lidarxistin di nav de rewşa jiyanî ya li Rojavayê Kurdistanê hate vegotin û ji bo xurtkirina têkiliyan nîqaş çêbûn. Di komxebatê de hejmareke rewşenbîr, siyasetmedar û nivîskar amade bûn, herwiha endamên dezgehên girêdayî hikumeta Herêma Başûrê Kurdistanê de di komxebatê de cih girtibûn."

**'zagonên jin li Sûriyê û Îraqê nayên qebûlkirin'**

Rohat Xelîl daxuyakirin ku hin zagonên jin li Sûriyê û Îraqê nayên qabûlkirin û wiha domand: "Li Rojavayê Kurdistanê û diheman demê de li Başûrê Kurdisatanê zehmetî di milê zagonên jinan de heye. Çawa ku li Rojavayê Kurdistanê hin zagon di derbarê jinê li herêmên me tên dîtin û di nava hikumeta Sûriyê nayên qebûlkirin heman tişt li Başûrê Kurdistanê jî ji aliyê hikumeta Îraqê ve nayên qebûlkirin



lê li herêmên Başûrê Kurdistanê tê dîtin. Ji bo vê jî em weke jin hewaldidin ku xortbûnekê di navbera herdu cihan de çêbikin, ji ber ku mijarê jin sînoran derbas dikin. Tecrûbe û berdêlên ku jinan daye gelek mezin û giranin ji bo vê jî pêwîste em wan biparêzin."

**'Ji bo parastin mafê jinê pêwîstî bi têkoşîneke hevpar heye'**

Seroka Desteya Jin a Cizîrê Rohat Xelîl axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di hefteya pêşiya me de em weke desteya jin derbasî paytexta Sûriyê Şamê dibin, da ku entegrasyon di navbera desteya jin û desteya mal û şênî re were çêkirin. Di destpêkê de em ê fermiyeta saziyê xwe çêbikin piştre em ê van gavan bavêjin. Ji xwe desteya jinê weke xwe dimîne, lê hin navendên girêdayî wê bi hin cihên din ve tê girêdan. Ji bo vê jî û ji bo misogerkirina mafê jinê di destûra Sûriyê û Îraqê de pêwîstî bi têkoşîneke hevpar heye."

# 'Em êrişên li ser jinên Kurd şermezar dikin'

**Aryen Hesen/Qamişlo**

**Jinên Qamişlo diyar kirin ku bi salên dirêj jina Kurd li hember zihniyeta zayendperest ku îradeya jin qebûl nake têkoşîn dikin û heya roja îro ew têkoşîn berdewam e û wiha gotin: "Em êrişa li ser jinên Kurd li Til Eran û Til Hasilê şermezar dikin."**

Li gundê Til Eran û Til Hasilê yên girêdayî Helebê, hêzên ewlekariyê yên girêdayî hikumeta demkî ya Sûriyeyê êrişeke pêk hat, ev êriş di bin navê operasyona leşkerî û serdegirtina berfireh bû, lê bû sedema binpêkirinên giran, êşkencekirina jinan û girtina ciwanên Kurd. Hêzên ewlekariyê yên girêdayî hikumeta demkî ya Sûriyê, bi zêdetirî 200 wesayîtan û motorsîkletên bi çekên navîn ketin wan gundan û ciwanên Kurd girtin. Heman demê de bi awayekî hovane li jin û dayîkên Kurd dan û êrişî wan kirin. Ev êrişa li ser jinan kurd di raya giştî de bû cihê bertek û nerazîbûnan.

Di derbarê şermezarkirina êrişên li ser jinên Kurd li Til Eran û Til Hasilê Jinên Qamişlo ên bi navê Nehle Tîlo



Nehle Tîlo

û Wedfa Îbrahîm ji Rojnameya me re axivîn.

**'Hişmendiya hikumeta demkî a Sûriyê li beramberî jina nehatiye guhertin'**

Nehle Tîlo diyar kir ku ew êrişên li ser Til Eran û Til Hasilê şermezar dikin û wiha got: "Himkumeta demkî a Sûriyê bi hişmendiyeke tundrew û hovane nêzî jinê dibe, her çiqas diyar dike ku hişmendiya wan li beramberî jinê hatiye guhertin, lê di vê bûyera û êrişa li Til Eran û Til Hasilê li ser Jina Kurd hatiye kirin nîşanda ku hişmendî û zihniyeta wan li hember jinê hîn nehatiye guhertin. Ev dixwazin vîn û îradeya jina Kurd bişkînin, lê tu carî nikarin ji ber ku jina Kurd bi



Wedfa Îbrahîm

berxwedanî, têkoşîn û sekna xwe ya Xort tê naskirin.

Em wê êrişa ku li Til Eran û Til Hasilê li ser Jina Kurd pêkhatî qebûlnakin û em şermezar dikin. Hêzên Ewlekariyê yên girêdayî hikumeta demkî a Sûriyê bi awayekî hovene êrişî gundê Til Eran û Til Hasilê yê girêdayî Helebê kirin û hin ciwanên Kurd girtin di heman demê de êrişî dayîk û jinan kirin. Nêzîkatiya wan li hember gelê Kurd û bi taybet li bermaberî jina Kurd nayê qabûlkirin, pêwîste ew kesên ku êrişî jina Kurd kirine werin cezakirin û xortên Kurd yên ku hatine girtin werin berdan. Herwiha ji bo bûyerên bi vî rengî li beramberî jinê careke din rûnedin, sûcdar were cazakirin û mafê jinê were dayîn pêwîste mafê jinê di destûra Sûriyê de were bicihanîn."

**'Salên dirêje jina Kurd li hember zihniyata tundî û hovîtiyê têkoşîn dike'**

Wedfa Îbrahîm destnîşan kir ku êrişa li ser jina Kurd êrişa li hember hemû jina ye û wiha pê de çû: "Salên dirêje jina Kurd li hember tundiya li ser jinê, neqebûlkirina îradeya jin û şermezarkirina hovîtiya li hember jinê li seranserî cîhanê tekoşîn dikin. Heya roja me ya îro têkoşîna me li hember vê zihniyetê didome û em ê têkoşîna xwe hîn berdewam bikin heya ku hemû jin dighêjin mafê xwe. Bûyera ku li Til Eran û Til Hasilê li hember jinên Kurd rûdeya ne di şexwê wê jinê tene de ye, lê belê di nava xwe de hemû jinan digire.

Jineke bi temen mezin ji ber ku parastin mal, zarok û birayê xwe dike rastî lêdanê tê, ev tevgera leşkerên hikumeta demkê li hember jinan divê di ber çavan re were derbaskirin û ew kesên ku destê xwe li ser jinên Kurd hildane pêwîste li pêşiya raya gîştî were cezakirin, ji ber ku eger neyê cezakirin wê êrişa li ser jinê ji xwe rawa bimîni."

Akademiya Jineolojî

## Di roja me de girîngîdayîna zargotinê

Îsyan Karadeniz

Nivîsandina dîrokê di destê mîrateya klasîk ya jinan biçûk dibîne de şêwe girtiye. Di ew mîrateya ku li ser îdealan şêwe girtiye de, azmûnên jinan biçûk hatine girtin, nehatine qeyd kirin û tomarkirin, tenê qada giştî û kirdeyên vî qadê azmûnên mêran hatiye hilbijartin.

Rûyê dîroka jinan ya nayê zanîn, nehatiye nivîsandin û weke ya din hatiye dîtin, bandorî li ser pêvajoyên avabûna nasnameya azadiya jinan jî kiriye. Bi perspektîfa Rêber Apo; ger dîrok di yekbûn û hevgirtina doh, îro û pêşerojê de dibe heqîqet, dîroka jinê ya nehatiye nivîsandin û zanebûna vê dûr hatiye ketin, mesafe datîne navbera jin û nasnameya azadiyê. Tekoşîna hebûnê nivî de dihêle. Yên ku hişmendiya dîrokê nikaribin bizîvirînin şîroveyên jiyanî, roja me jî nikarin bi wate şîrove bikin. Civakekî bê dîrok, astekî baş de fêmkirin û jiyankirin ne gengaze. Ew rewş ji bo jinan dijwartire, ji ber ku jin fêm nekirin, ji hebûna jin re mane nedayîn, tê wateya civakê û jiyanê fêm nekirinê.

Dîroka jinan ya nehatiye nivîsandin, di dîroka nivîskî û zanista dîrokê de her çiqasî tine hatibe hesibandin jî, kevneşopiya dîroka devkî ya jinan, bûye rêbaza vegûhestina kolektîf ya hafizayê ya ji rabirdû heta pêşerojê. Dîroka devkî ya jinan salên dirêj weke rêbazekî zanistî nehate dîtin. Lê salên dawî de, bi tekoşîna jinan di nava cîhana akademîk de hin lêgerîn pêşketine. Zargotina jinan rêbazekê ji bo azmûnên jinan ya jiyanê û helwest û seknên wan ya dîrokî were qeyd kirine.

Zargotina jinan armanc dike ku agahî û zanebûnên dîrokî ya giredayî jiyana rojane ya jinan, têkiliyên malbatî û civakî, tevlîbûnên wan yê tevgerên civakî û tekoşîn û şeran û hwd. berhev bike. Zargotin, bîra kesan û civakan xûrt dike. Yên ku dîroka xwe baş nizanin, nikarin îroya xwe û pêşeroja xwe jî bi tendirûst ava bikin. Ew ji bo jinan qat be qat derbasdartire.

Di roja me de girîngî dayîna zargotinê û hêza zanebûnê her ku diçe kêm dibe. Hafizaya devkî ya civakan bi bandora modernîzmê weke xurafe tê dîtin, yekbûna cehwerî, hêza wateyê, rêgezên jiyanê ya ehlaqî û polîtîk ya her çîrokekî de weke tiştên nerast tê dîtin û ji hêla zanista fermî ve nederbasdar tê pejirandin. Ji ber vê yekê xwe gihandina hêza wateyê ya dîroka devkî û bi vê hêzê li beramberî serweriya zilaman ya di nava dîroka devkî de berxwedayîn, ji bo tekoşîna azadiya jinan pir girînge. Heman tişt ji bo gelên ku bê dewlet dijîn û hatine tinekirin jî wisaye. Dîrokekî nivîskî ya Elewiyan, Yaresanan, Ezîdiyan nîne. Di wan gelan de hafizeya devkî bi reya qewlan, beytan, lawjeyan digihîje heta roja me yê îro. Lê rewşa ku di heqîqeta jinan de tê jiyîn, ji bo gelên ku hatine pelçîqandin jî derbasdare.

Têgihiştina peywendiya di navbera xwe pênasekirin û zanebûna dîroka xwe girînge. Rêber Apo dibêje; ''taybetmendiya bingehîn xwezaya mirovên azad ewe ku dikare dîroka xwe hilbijêre û bikaribe bi vê dîrokê re jiyan bike. Dîrok şîrovekirina hebûn û pêvajoyên ku pêk têne ye. Çiqasî hebûnên cûda hebin, ewqasî dîrok jî hene. Lê cûdabûna dîrokê naye ew wateyê ku yekbûn û hevgirtina dîrokê nebe.'' Bi wan gotinan Rêber Apo balê dikşîne ser peywendiya dîroka jinê û dîroka giştî. Ne tenê ji aliyê dîroka jinan ve, ji bo dîroka Kurdan, dîroka Ezîdiyan an jî ji bo dîroka civakekê din jî heman tişt derbasdare. Bi tena sere xwe dîroka Kurdan, Tirkan an jî Ereban nîne, nexwe dîroka jinan jî pêwiste bi peywendiya dîroka civaka dîrokî ve were bidest girtin. Di axên ku şoreşa jinê ya yekemîn hatiye jiyan kirin de, di Jineolojiyê ku bi îdîaya dê bibe zanista palpişt ku şoreşa dûyemîn ya jinan xwe bispêre de, bi epîstemolojî û metodolojiya nîvenda vê de jin heye dîrokê bidest girtin û hêza maneyê ji nû ve avakirin girînge.



# Belavbûna nexweşiya Kolêrayê li Sûdanê

Rêxistina Tenduristiya Cîhanî diyar kir ku ji ber belavbûna nexweşiya Kolêrayê 120 kesan li Sûdanê jiyana xwe ji dest dane di heman demê de 11 hezar û du rewşên ku dibe bi nexweşiyê ketine hatiye tomarkirin.

**Navenda Nûçeyan**

Rêxistina Tenduristiya Cîhanî roja çarşemê 1'ê Tîrmehê bîlançoya hejamra kesên ku ji ber nexweşiya Kolêrayê di pêla sêyemîn de jiyan xwe ji dest dane diyar kir, hate zanîn ku 11 hezar û du kes dibe ku bi nexweşiyê ketine û 120 kes jî jiyana xwe ji dest dane. Ji ber şerê ku ev sê sal di navbera artêşê Sûdanê û Hêzên Piştgiriya Bilez berdewam dike, sektora tenduristiyê bi awayekî mezin hatiye hilwişandin. Pêla nexweşiya Kolêrayê ya heyî wekî ya sêyemîn di seranserî sê salan de tê hesibandin, ev yek piştî belavbûna ku di Adara borî de hat raghandin, hat.

**Pêla sêyemîn**

Pêla heyî ya Kolêrayê ya sêyemîn di seranserî sê salan e, nexweşî dîsa piştî raghandina bidawîbûna wê bi du mehan di Adara borî de, destpê kir. Li gorî hejmarên fermî yên ji hikumetê zêdetirî 100 û 24 hezar herwiha 400 kes bi Kolêrayê ketin, di heman demê de 3 hezar û 500 di pêla dawî de di navbera Tîrmehê û Adara 2026'an de jiyana xwe ji dest dane.



Serokê Rêxistina Tenduristiya Cîhanî li Sûdanê Şebel Sehbanî got, Nexweşiya Kolêrayê li bakur-rojhilatê Afrîqayê berê her sê salan belav dibû, lê niha ji ber pevçûn û sînorkirina gihaştina cihên diyarkirî û kêmbûna dabînkirinan, welat rû bi rûyê belavbûbneke berdewam e.

**Demsalên baranê**

Li gorî texmînên rêxistinê tevgera koçberiya navxweyî, bilindbûna hejmaran mirovan di stargehan di li gel demsalên baranê ku bandorê li ser kalîteya çavkaniyên avê dike, wekî faktorên serke ne ku xeteriya belavbûna nexweşiyê li çend wîlayetên Sûdanê, bilind dike, ev jî bersivdayîneke tenduristî û mirovahî ya tavilê pêwîst dike.

Hêjayî gotinê ku hikumeta Sûdan hefteya çûyî li wîlayeta rojavayê Kerdevanê belavbûna nexweşiyê raghand, ji xwe ev herêm xeta şer di navbera herêmên di bin desthilatdariya artêşê û Hêzên Piştgiriya Bilez de ye.

**Nexweşî xuyaye belav dibe**

Rêxistina Tenduristiya Cîhanî, piştî ku 300 rewşên dibe ku bi nexweşiyê ve ketine û sê rewşên mirinê li wîlayeta bakurê Kerdevanê tomar kirin, raghandin ku xuyaye nexweşî belav dibe. Di heman demê de Neteweyên Yekbûyî hişyarî da ku Hêzên piştgiriya Bilez hazirtiyê xwe yê êrişeke bejahî li ser bajarê El-Ebyed, dike. Herwiha cîgerê sekretêrê Neteweyên Yekbûyî yê kar bû barên mirovahî îşaret kir ku êrişên li ser stasyonên elktrîkê li bajêr, gîhaştina ava vexwarinê asteng dike û hişyariya xeteriya çêbûna hovîtiyeke mezin da.

**Piraniya nexweşxaneyan ji xizmetê derketine**

Piştî sê salan ji şer, rêxistinên alîkariyê texmîn dikin ku zêdetirî 200 hezar kes hatine kuştin, herwiha piraniya nexweşxaneyên welêt bi tevahî an jî qismî ji xizmetê derketine.

Sehbanî wiha diyar kirye "Ji sedî 40 navendên tenduristiyê ne di xizmetê de ne, di heman demê de nêzîkî ji sedî 60 tenê bi awayekî qismî kar dikin, ev tê vê wateyê ku ew xizmetên sînorkirî an jî ne têrker ji nexweşan re peyda dikin."

**Girîngiya gîhaştina alîkariyên mirovahî**

Tenduristiya Cîhanî tekez kir ku nexweşiya Kolêrayê, nexweşiyeke vîrusî ye ya xeter e, ew bi gelemperî di rêya vê û xwarina qirêj vediguheze. Miorv dikare di rêya dabînkirina ava paqij û bi ewle, başkirina xizmetguzriyên kanalîzasyonê û xurtkirina tedbîrên paqijiya kesane rê li ber belavbûna wê bigre, hewiha bilezbûna naskirina rewşên ku pêketine û pêşkêşkirina dermankirina guncav, ev yek dê rêjeya mirinan bi awayekî mezin kêm bike.

Rêxistinê bang li civaka navneteweyî û hevalbendên ku di aliyê mirovî de kar dikin kir, ku piştgiriyeke berfireh ji bo sektora tenduristiyê li Sûdanê pêşkêş bikin, di nav de dabînkirina dermanên Kolêrayê û yên girêdayî wê, wekî din piştgiriya bernameyên nexweûiyan û xurtkirina tîmên bersivdayîna bilez ji bo rêgirtina belavbûnê.

Di heman demê de girîngiya misogerkirina gihîştina bê asteng a alîkariyên mirovî û bijîşkî bo hemû deverên bandordar tekez kir û hişyarî da ku xirabtirbûna berdewam a rewşê dikare bibe sedema zêdebûna veguhestina nexweşiyê û mirinan, ne tenê ji ber kolerayê, lê belê belavbûna nexweşiyên din ên vegirtî ji ber qelsiya xizmetên lênihêrîna tenduristiyê.

# UNICEF: 20 milyon zarok ji mezinan zêdetir hişê çêkirî bikar tînin

**Navenda Nûçeyan**

**Analîzek nû ya UNICEF'ê eşkere dike ku zarok ji mezinan zêdetir hişê çêkirî bi kar tînin, herwiha bi milyonan zarok AI ji bo pêkanîna karên dibistanê û lêgerîna şîretên kesane bikar tînin, di heman demê de tedbîrên ji bo parastina wan pir li paş ve mane.**

Analîzek nû ku ji hêla UNICEF'ê hatiye derxistin eşkere dike ku herî kêm 20 milyon zarok li deh welatan hişê çêkirî bikar anîne, zarok vê teknolojiyê ji mezinan bêtir bi awayekî zûtir digirin dest. Ajansa Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku zarok bi rêjeya sê qatan zêdtir ji mezinan hişê çêkirî bikar tînin, ev dane li gorî lêkolîna ku li deh welatan hatiye çêkirin, hatine berhevkirin. Di encamê de hatiye nîşan dan ku zêdetirî du milyon zarok, yanî yek ji deh zarokan, gotine ku dema ew hewcdarî şîretan li ser mijarên ku bi wan ve girêdayî ne hişê çêkirî bikar tînin. Di heman demê de tê texmînkirin ku bi qasî 13 milyon zarok van amûran ji bo fêrbûn û karên wan ên dibistanê bikar tînin.


**UNICEF'ê hişyariya belavbûna bilez a hişê çêkirî dide**

UNICEF'ê hişyariya belavbûna bi lez a vê teknolojiyê da û diyar kir ku li gorî hewildanên ji bo rêxistina wê pir zûtir e, ev yek jî bi awayekî taybet zarokan li hemberî xeteriyan ve dihêle, ji ber ku zarok yên herî zêdetir rastî pergalên hişê çêkirî tên, di nav de çawaniya dîzaynkirin û modelên wê yên bazirganiyê herwiha çawaniya bikaranîna daneyên wan yên kesayetî.

Ajansê lê zêde kir ku şiyana zarokan a dûrketina vê pergalê pir kêm e û piraniya çarçoveyên desthilatdariya hişê çêkirî zarokan nadin pêş. Di heman demê de jî ajansê hişyarî da ku bandora dem dirêj a vê teknolojiyê li ser ciwanan heya niha ne diyar e û zelal kir ku delîlên di derbarê rola wê di pêşketina zanînê, girêdayîbûna hestyarî û lawaziya zirarê de ji nû ve dest pê dike, di encamê de tê diyar kirin ku nifşeke tam di nava ezmûneke gerdûnî ya mezin de mezin dibin. Gelek zarokan jî fikarên xwe li ser vê teknolojiyê anîne ziman.

**Zarok bi fikarin derbarê bikaranîna hişê çêkirî**

Li gorî analîzê, sêyeka zarokên di nava welatên ku lêkolîn lê hatiye kirin gotine ku ew derbarê bikaranîna hişê çêkirî bifikar in, ji bo xapandin an jî belavkirina agahiyên çewt. Di heman demê



de çaryeka wan jî ditirsin ku bi wêne an jî vîdyoyên wan werin lîstin û wan veguherînin naverokek eşkere ya cinsî.

Ev encam beriya yekem Diyaloga Cîhanî ya Neteweyên Yekbûyî li ser Desthilatdariya Hişê Çêkirî (AI) hatin weşandin. UNICEF'ê daxwaz ji hikûmetan, sektora taybet û hevkarên din kir ku mafên zarokan, bi taybetî mafê wan ê ewlehî û parastinê, di çarçoveyên desthilata AI ya cîhanî de entegre bikin. Di nav de veberhênana lêkolînên li ser bandora AI li ser pêşketina zarokan, bi balkişandina li ser xetereyên muhtemel. Ajansê ev qonaxa heyî wekî "gavek krîtîk" bi nav kir û tekez kir ku hilbijartinên ku îro li ser AI têne kirin dê ji bo dehsalên pêş de ewlehî, daneyên kesayetî û gihîştina wekhev a derfetan a zarokan, diyar bikin.

# Bi guhertina rêyên bazirganiyê re wê dewleta Tirk li paş bimîne

**Leyla Waşûkanî**

Tekez gerek em pir baş li ser guhertina rêyên bazirganiyê û siyaseta li pey wan rêyên bazirganiyê yên nu fambikin; ji bo ku em hîn baştir fambikin û weke netewa Kurd jî em bizanin bêka li ser me weke milet û herêm, çi siyaset têye gerandin. Weke ku tê zanîn di van çend salên dawiyê de û nexasim, jî di sala 2023 de û bi taybet jî, di civînên ku hatin li darxistin, de weke wan civînên di pileya netewî de û bi taybet jî yên dawiyê pir giringin bûn, wek lûtkeya NATO gelekî giring bû û hilbijartinên ku li tirkiyêyê jî pir giring bûn. Ji xwe şerê ku li Ûkranya yê û mijara, endemtiya Îsveç û Filandiya jî di rojevê debû, ji xwe nêzîkatiyên ku derketine pêş yên wek ferdperest, sûdmend û teng mohra xwe li lûtkeya NATO daye. Ji bo hinek sûd girtina ji Ûkranya têkoşîn kirin. Di mijara endamtiya Îsveçê ya NATO yê, hinek nermbûn dan siyasetê û hişmandiya rêvaberiya Erdoxan a dijminatiya Kurdan û piştgirî danê û ew ji mirinê xelas kirin. Ji bo demeke kurt hilweşîna wî asteng kirin, ger ku wiha neba wê bi têkoşîna gelê Kurd, gelê Tirk û jinan wê hilwaşîba. Lê wan hêzên tarî û komploger wî li ser lingan hiştin û ger ku, wiha berdewam bike tekez wê vê carê xelas nebe û wê pir jî demdirêj berdewam neke. Serokên partiya herî zêde bi desthilatdariya; difikirin û nikarin xwe, ji hesabên xwe yên ferdî xelas bibin û ji berjewendiyên welat û gel zêdetir; bi berjewendiyên xwe yên kesayetî dihizirin û nikarin gavên mezin, bavêjin û tirsa wan ji çareseriyê heye. Lê gerek were zanîn ku tirsa wan ji çareseriyê wê bi wan, bide wenda kirin.

Dibe ku Erdogan bi xwe jî weke ferd û partî jî zererê bibine û wenda bike, ji xwe dema ku neyê çareseriyê wê hîn zêdetir wenda bike. Ji xwe herî dawiyê Kazakistanê jî di civîna Astanayê ya dawiyê de, gotin ku emê hew malavaniyê bikin û ev jî têye wateya ku pêvajoya ku hinase dida Erdogan jî li wir xerabû. Ji xwe di hevdîtina ku herî dawiyê bi Pûtîn re kiriye de ti encam negirtiye û ji ber ku, siyaseta wan hatiye naskirin û hew kes ji wan bawer dike. Tê naskirin ku ew aliyên cüda ku Erdogan hêviyên xwe bi wan ve, daye girêdan jî jêre tiştekî nakin ji ber ku ew jî xwedî berjewandî ne. Erdogan weke serok dewlet di wan berjewandiyên xwe de, zehmetiyên xwe hene ji ber wê piştgirîyê dixwazin, lê wiha li wan hat ku ne diyare bêka wê kî bi kêre piştgirî bike.

Wiha li wan hat ku tişta ku wê weke dewlet encam jê bigirta nema. Tê gotin ku Putîn hesebekî pir cidî dike. Ew niha li ser raghandinê, diyar dikin ku rêveberiya Putîn di alîkarî û piştgiriya rêveberiya Erdoxan re wê şaştiyek dîrokî be. Her çiqasî raste mirov nizane lê di demên dawiyê de li ser ragihandinê, aliyên rast yê vê nirxandê tê dîtin. Dêmekî herdû jî hevdû bi kar tînîn, lê ji niha û şûnde nema dikarin hevdû bi kar jî bînin û wê dijberiya wan jî bi hevre çêbibe. Ev lûtkeya G 20 ya dawiyê de jî zêdetir pêşketinên bi vî awayî diyar dikin. Heyanî nîşan jî dan ku, di asta gerdûnî de siyaseta dewleta û tekoşîna wan di navberên hêzên navandî de çawa dimeşe têkilî- nakokî yên ku wê encamên çawa derxistine holê. Balkêşe ku ev rewşa ku demeke têye gotin ku giftûgo kirine, Çînê tewriya bi navê nifşek; pirojak a rê avête holê.

Vê hişmendiya avakirina rêyên nû yên enerjîyê ava kirin. Bi rastî di şerê Rojhilata Navîn û Ûkraniya de, bi qasî ku dixwazin ku bibin xwediyê çavkaniyên enerjiyê, ewqasî jî dixwazin ku hişmendiya xwe bandorê li ser xetên enerjên çêbikin û bibin xwedî roleke giring. Yek ji sedemên van şeran jî eve. Di despêka şerê Ûkranyeyê de jî gelek nerîn, nirxandin û tesbît jî hebûn ku pêşketinên heyî jî wan tespîtan biştrast derxînin. Li vir rewşa rêveberiya Ûkranya jî bi bandor bû, Ûkranya di mijarên enerjiyê de xwedî giringiyeke, pir mezine û her kes wê berhema wan ya enerjiyê dizane. Di mijara ku wê kî li kude bi bandor be, ji wan re girînge û şer jî hinekî ji ber vê hate li darxistin lê –ev ne sedemeke yekane ye. Cardin jî wiha tê dîtin ku sedem pir giringin.

Dîsa şerên li Rojhilta Navîn yê Îraq û Efganistanê û nexasim jî piştî wê, vekişîna DYE ya ji Efganistanê û gûftûgoyên NATO yê hevdîtinên li Rojhilata Navîn, yê DYE- Îsrayîl dîsa hevdîtinên ku navenda wê Sudî Arabistan bûye û Çîn -Îran hevdîtin çêkirin, Îsraîl bi Yunanistanê û welatên Arab re, hevdtin çêkirin û li ser wê bingehê jî li hev kirin. Lihevhatina wan ku polîtîkayeke aktîf bi hevre bi meşînin. Di civîna dawiyê ya G 20 de, rêyên enerjiyê hatin niqaş kirin û bi hevdûre zelal kirin û îtîfaqa xwe paşî temam kirin. Bi rastî ev pir giringe, li ser vê bingehê qala du rêyan kirin. Rêyek ji wan wê di ser, Çîn- Rûsya re heyanî Bakurê Deryaya Reş re û ji wir, jî wê derbasî Ewropa yê bibe. Ev bi giştî rêya bejahiya. Şerê li Ûkranya yê wê di heman demê de bibe şerê herî bi bandor li ser vê rêyê be. Weteyek vê jî teqaz jî eve.

Vekirina vê rêyê jî bê guman wê şer bi xwe re bi dawî bike. Wê bidemêre şerê Ûkranya jî hinek jî diyar bibe û ew jî vekirina vê rêyê ye. Şerê ku dê li ser vê rêyê, ku wê kî çiqasî par bigre ye. Ger ku lihevkirin çêbibin wê şer bi dawî bibe. Heyanî ku li hevkirin çênebe jî wê şerê berjewendiyan jî berdewam be. Rêya din jî Hindisatnê ber bi Sûdî Arabistanê ve û ji wir jî wê di ser Ûrdinê re heyanî “Îsrayl, kibrsa başûr Îsraîl, Qûbrisa Başûr û heyanî Yunanistanê, di Deryaya Sipî re rêya duyemîne. Ev rê hem deryayiye hem jî bejahiye. Nexşeya wê hatiye diyar kirin û zelal jî kirin e. Ji demekî heya niha hevdîtinên dewletên têkîldar çîbûn. Piştî vê civîna G 20 ê gihaştin îtîfaqa xwe û paşî îlan kirin. Hindidatan bi Çînîre dibe yek. Bi vî awayî Çîn hem di Bakûrê Deryaya Reş re rêya bejahî, hem jî di ser Hindistan, Erebistana Sûdî, Îsraîl û Deryayê Sipî a Rojhilat re xwe girêdayî Ewropa yê dike.

Têye gotin ku çavkaniyên din yên enerjiyê, dê bi van rêyan re bên girêdan, û her wiha wê, enerjiyê derbasî wan rêkan jî bikin. Dema ku mirov li rewşê temaşe dike ji mirov re pirseke wiha, dertê pêşde başe niha- ev têye çi wateyê? Rêya dîrokî ya hevrîşmê wê ji dîrokî were rakirin û ev jî tê, weteya ku mohr kirina wê yanî li şûna wê çawa îtîfaqa nû çêdibe û rêyên nû têne peyda kirin. Rêya hevrîşmê di tengavan re di ser Tirkiya, Îran, Efganistan re têne derbaskirin û heyanî Çînê jî’ diçe. Ev rêya kerwana ya bihezarê salan xizmeta bazirganiyê kiriye û îdî ji dîrokê, têye rakirin û giringiya xwe ya dîrokî winda dike û ev rê tine dibe. Li şûna wê du rêyên din ji Bakûrê Deryaya Reş û Hindisatan, Îsrayîl û Rojhilat re derbasî Ewropayê dibe. Tê diyar kirin ku wê ev rê rêyên ku me li jêr dane diyar kirin, cihê rêya hevrîşmê bigirin. Ji ber wê jî rêya hevrîşm ji dîrokê radikin. Ev tê çi weteyê?

Axên ku rêya hevrêşmê têre derbas dibûn û ciyên bazirganiyê bûn, wê werin betal kirin. Îdî wê nebe rêya bazirganiyê ji ber wê, girîngî û aktîfbûna xwe wenda dikin, yanî wê sûdê ji bazirganiyê negirin. Di serê wan hereman de jî Tirkiya tê, em pir baş di zanin ku Komara Tirkiyê û çîna wê ya serdest, xwe ji bo ku herdem bazirganiya cîhanê bike amede dikir. Ew rêya jî pir Îstiratîjîk bû dewletê xwe bi wê rêyê li ser lingan digirt, gelo wê niha çawa bike? Ev giringiya îstirtîjîk a Tirkiyê ji bo wê rêyê bû. Rêyê bazirganiyê ew jî rêya hevrîşmê bûye. Îdî rêya ku Asya bi Ewropa ve dida girêdan jî ji holê rabû, yanî Tirkiyê bê wete dibe û ji xwe rola Tirkiyê ya îstirtîjîk rabû wê Tirkiyê nema karibe para; xwe ji bazirganiyê bigire û wê zerarên mezin bibîne.

Wê Tirkiya di hêlên aborî, siyasî û çandî de têkeve rewşa paşketinê û wê tengasiyê bikişîne. Rewşa Tirkiyê ya ku di civîna G 20 de hate niqaş kirin eve. Raghandina AKP û Erdoxan dibêjin ku em wan rêya, na pejirînin û dixwazin ku pirovakasyonan çêbikin. Ji xwe hertişt temam jî bûye û her kesî îtfaqa xwe çêkiriye û Tirkiyê ji derve maye. Gelo çima hat vê astê ji ber ku dewleta Tirk her ji çareseriyê direvin û li Rêber Apo guhdarî, nakin û ger ku wiha berdewam bikin wê xeteriyên pir mezin jiyan bikin û wê sedsaleke; din jî ji şer û tundiyê jiyan bikin û ger ku dixwazin pirsgirêkên xwe, çareser bikin wê zagonên destura bingehî biguherin û wê li Rêber Apo guhdarî bikin.

# Pêşbaziya hêzên mezin, manevrayên dîplomatîk

**Botan Amed**

Krîza dawî ya li Rojhilata Navîn wekî serdemek tê dîtin ku bi karanîna dîplomasî û ragihandina stratejîk a tund, ji pevçûna leşkerî wêdetir, tê xuyang kirin. Têkiliyên di navbera Îran û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de, ku bi rêya kanalên cûrbecûr hatine kirin, ji ber eşkerekirina wan a sînorkirî ya giştî, bûne mijara gelek şîrove û senaryoyan. Analîz eşkere dikin ku agirbest û têkiliyên dîplomatîk ne hewce ye ku were vê wateyê ku alîyan armancên xwe yên dawîn terikandine. Agirbest carinan ne dawiya pevçûnê ye, lê belê pêvajoyek ji nû ve bicihkirin û amadekariyê ji bo qonaxa din e. Ji ber vê yekê, pêşketinên dîplomatîk û çalakiya leşkerî li ser erdê divê bi hev re werin nirxandin. Bi heman awayî, analîzên cûda dikarin di derbarê helwesta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de di dema krîzê de werin kirin. Em dikarin bibêjin ku Washington tercîh dike ku ji şerekî herêmî yê rasterast û dirêj dûr bisekine; ev bi lêçûnên aborî, pêşbaziya gerdûnî û hevsengiyên siyasî yên navxweyî ve girêdayî ye. Lêbelê, ev nêzîkatî ne wekî paşvekişandinek, lê wekî ji nû ve rêxistinkirina pêşanîyan û tekezkirina li ser rêbazên nerasterast ên bandorê jî mimkun e ku were şîrove kirin. Her çend her du nêzîkatiyan alîgirên xwe hene jî, pêşketin bi xwe dê nîşan bidin ka kîjan di demek dirêj de rasttir e . Ji perspektîfa gelê Kurd ve, eşkere ye ku polîtîkayên ku ji hêla aktorên siyasî yên cuda yên Kurd ve di vê pêvajoyê de têne meşandin, stratejiyek hevpar pêk naynin ku ji navendek yekane ve tê birêvebirin. Şert û mercên siyasî û yasayî yên cuda li Iraq, Sûriye, Îran û Tirkiyeyê dibin sedem ku her aktor li gorî çarçoveya xwe tevbigere. Ji ber vê yekê, nêzîkatiya ku wekî “rêya sêyemîn” tê pênasekirin di her avahîsaziyê de bi yekrengî nayê sepandin. Aliyê hevpar ê vê yekê dikare wekî hewldanek were şîrove kirin da ku ji bûyîna aliyekî rasterast di têkoşîna desthilatdariya herêmî de dûr bikeve û destkeftiyên ewlehî û siyasî yên civaka herêmî pêşîniyê bide. Dema ku em ji vê perspektîfê ve li pêncî salên dawî yên Rojhilata Navîn dinêrin, em dikarin bibînin ku têkiliyên ku bi hêzên derve re hatine damezrandin pir caran ji hêla guherîna hevsengiyên jeopolîtîk ve bandor bûne û garantiyên ewlehiyê yên mayînde çênekirine. Li gorî vê yekê, tewra dema ku têkilî bi aktorên derve re têne damezrandin jî, parastina îradeya herêmî di pêvajoyên biryargirtina siyasî de divê wekî faktorek diyarker ji bo aramiya demdirêj were dîtin. Lêbelê, lêçûnên mirovî yên şer ji van hemî nîqaşên jeopolîtîk wêdetir girîng dimînin. Sivîlên koçber, binesaziya zirardar, tengbûna aborî û fikarên ewlehiyê yên zêde rasterast bandorê li jiyana rojane ya gelê herêmê dikin. Ji ber vê yekê, çareseriyên dîplomatîk ên mayînde divê li ser pêşbaziya leşkerî girîngtir bin.



# ‘Divê gelê Başûrê Kurdistanê îro berî sibe hişyar bibe’

**Kamîran Berwarî da zanîn ku veguherînên Rojhilata Navîn ên nûjen berî her tiştî metirsiyê li ser Kurdistanê çêdike û got, “Rewşa Başûrê Kurdistanê metirsîdar e, gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê ji vê rêveberiya heyî ne razî ye û divê gel îro berî sibe şiyar bibe û rabe ser piyan.”**

**Hemza Sêvo**



Di serdema heyî de guherîn û projeyên nû yên siyasî li Rojhilata Navîn tên çêkirin, Kurdistan dikeve bin bandora van geşedanan, niha ev yek bi awayekî yekser bandorê li Başrûrê Kurdistanê dike, yekrêziya Kurdî li Başûr li hemberî polîtîka û planan jî mijara nîqaşa tevahiya gelê Kurd e. Derbarê van mijarên derbasbûyî siyasetmedar Kamîran Berwarî bersva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Wekî tê zanîn Rojhilata Navîn di nava şer û guhetinê de ye, ev yek xeteriyeke çawa li ser Başûrê Kurdistanê diafirîne?**

Em dizanin ku Rojhilata Navîn di qonaxeke veguherînê re derbas dibe, ev veguherîn ne tenê bi Rojhilata Navîn re peywendîdar e, ji ber ku pirsgirêk û projeyeke cîhanî ye. Di nava vê nexşerêya nûjen de hêzên cîhanî yên mezin cihê xwe digirin. Herwiha karîgerî li ser siyaset û aboriya cîhanî heye. Ev veguherîn berî her tiştî metirsiyê li ser Kurdistana mezin çêdike, ji ber ku ev pêngavên tên kirin, armanceke sereke jê ew e ku destkeftiyên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê tesfiye bikin. Herwiha berî çend rojan welatên Ereban li Behrên civînek li dar xistin, armanc ji bo ku ew bi melyarên dolaran palpiştiya dewleta Tirk bikin da ku Şotreşa Rojava tesfiye bikin. Ji bo Başûrê Kurdistanê jî plan têne kirin, projeyeke mezin û dagirtî heye, Sûriye, Îraq, Îran û Tirkiyê herwiha hin hêzên cîhanî cihê xwe di vê projeyê de digirin. Hewldanên wan hene ku di dema pêş de destûra Îraqê biguherînin, Îraqeke nû ava bikin, navê Îraqa fedral nemîne, hikumeteke Başûr nemîne û bibe sê parêzgehên Îraqê. Ev yek gav bi gav tê pêkanîn, em dibînin ku roj bi roj karîgeriyeke mezin li ser rêveberiya herêma Başûrê Kurdistanê tê kirin. Niha jî Îraq destê xwe datîne ser sînoran, ser gumrikan, balafirgehan, saziyên civakî, dahatên navxweyî û mûçeyên karmendên Başûr, ew her û her pê de diçe û dixwaze imtiyazatan di destê herêmê de nehêle. Weke tê dîtin ku hikumeta Başrûrê Kurdistanê ne xwedî şiyan û fermiyeteke, ew hikumeteke karbirêker e, ev sal û nîveke ku hilbijartin çêbûne û hîna hikueteke nû nehatiye avakirin. Ji aliyê din ve gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê ji vê rêveberiya heyî ne razî ye û hez dike ev rêveberî bi her awayî were guhertin, eger were guhertin û hikumeteke din bi heman hişmendiya desthilatdariya Başûr were ew ê Başûrê Kurdisatnê li ser nexşeyê nemîne.

**-Çi dibe asteng li pêşiya yekrêziya partiyên Başûrê Kurdistanê û gelo heya çi astê hewldanên Kurdistanî ji bo nêzîkatiya partiyê Başûr têne kirin?**

Di serdema heyî plan û karîgerî li ser tevahiya Başûrê Kurdistanê heye, ev destkeftiyên neteweyî ku berhemên xwîna şehîdên sed salan in di xeteriyê de ne, plan heye ku ev destkeftî ji holê bên rakirin. Mijara yekrêziya partiyên siyasî li Başûrê Kurdistanê û mercên ku niha tê de dijîn û ew ê çi were kirin di rojevê de ye. Partiyên siyasî li Başûr bi piraniya xwe ve bi deng, reng û bernameyên xwe tevnagerin, ew bi ejindeyên derve ve girêdayî ne. Partiyên siyasî li gorî berjewendiyê hêzên herêmî yan cîhanî kar dikin, piştevaniya wan ne ji gel, ax, welat, şoreşger û xebatkarên wan e, piştgirî û sedema hebûna wan bi hêzên herêmî û cîhanî ve girêdayî ye. Ev hêzên herêmî û cîhanî jî partiyên Kurdî li Başûr ji bo xwe bi kar tînin, ji ber vê yekê em dibînin ku pêkanîna yekrêziya partiyên siyasî tiştekî gelekî zor e, ji ber ku ew ne bi serê xwe ne, piraniya wan jî li dijî hev kar dikin. Di dema heyî de me nedîtiye ku nêzîkbûneke van partiyên Kurdî çêbûye. Ji sala 1993’yan û bi şûn de hin nêzîkbûneke partiyên siyasî çêbû, aramnca wan partiyan jî ew bû ku partiyên resen ên niştîmanperwer tesfiye bikin, ev yek jî pêkhat, me dît ku çawa sê partiyên Kurdî hatin têkbirin. Bi dîtina min eger hikumetek bihata ser desthilatdariyê û biryara hilweşandina hemû partiyên Başûrê Kurdistanê girtiba ew ê rewşa Başûr baştir bi rê ve çûbaya ji vê rewşa ku niha em tê de dijîn.

**-Riya çareserkirina nehevrêziyê çi ye û ji bo pêkanîna yekîtiya Kurdî erka ku dikeve ser milê gelê Kurd de çi ye?**

Amûra pêkanîna yekrêziya Kurdî û partiyên siyasî her Kurd bi xwe ne, şiyana kîjan alî heye ku biryara hebûna partiyan bimîne yan na, an jî deng bide partiyan? Çiqasî partî deng bînin yan bi ser bikevin an na bê guman di destê Kurdan de ye, di her halî de gelê Kurd xwediyê biryarê ye. Ji sala 1991’ê heya roja îro plana partiyên siyasî li ser gelê Kurd heye, hewldanên wan ew e ku vîna gelê Kurd were têkbirin, armancgirtina çand, zanist, ziman, perwerde û hwd… ya gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê tê pêkanîn, ev yek jî bi destê partiyên siyasî û bi hevkariya Îran, Tirkiye, welatên Ereban û dewletên cîhanî tê kirin. Destê welatên Ereban û yên cîhanî li Başûr gelekî dirêj e, wan di warê, aborî, civakî, perwerdeyî û hwd… de destê xwe daniye ser her tiştî û hikumeta Başûr weke teşe maye. Di heman demê de piraniya berbirsên Başûrê Kurdistanê bûne zengîn ser asta cîhanê û li gelek welatan kargeh û kompaniyên wan hene. Ev yek tê wateya ku herêma Başûrê Kurdistanê li hemberî metirsiyeke mezin hatiye, herêmeke bêdestû, bêparlemento, bêyasa, bêhikumet û bêyî her tişta ku dihêle herêm bi rê ve biçe. Ya herî girîng ew e ku gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê îro berî sibe hişyar bibe û rabe ser piyan, ev rêya çareseriyê ye, ya duyem jî partiyên siyasî bigihêjin wê baweriyê ku hikumê wan ne durist û ne rastkar e, ew ne xwedî hêza netewperweriyê û demokratîkbûnê, lewma divê vê rêveberiyê radestî xelkên Başûr bikin. Du rê li pêşiya Kurdan hene, yek jê pêkanîna yekrêziya Kurdan pêwîst e û ya din divê gelê Kurd li Başûr hemû berhem û hêza rêveberiyê ji destê partiyan û desthilatdarên hikumta Başûr derxe da ku ew bi rengekî demokrat, azadîxwaz, netewperwer û pêşkeftinxwaz xwe bi rê ve bibe.

# Meclisa Gel a Sûriyê: Parlamentoyeke bêdengder û krîza rewatiya bipaşxistî ye

**Cemîl Xoce**

Gava desthilata Şamê radigihîne ku avahiya “Meclisa Gel” temam bûye, ew behsa destkeftiyeke îdarî û teknîkî dike ku valahiya destûrî bi dawî dike. Lê di siyasetê de, ne hejmar û ne jî temambûna kursiyan, ew ê ku hêzê dide saziyan, lê “rewatiya gel” saziyan bi hêz dike. Sûriyeyî îro li ber parlamentoyekê ne ku bi awayekî şeklî temam bûye, lê valahiyeke kûr a temsîlî ku bi biryarên tayînkirinê yan bi hevsengiyên hejmarî yên ku desthilat ferz dike, nayê dagirtin.

Tiştê herî xeternak di pêkhateya vê meclisê de, mekanîzmaya gihîştina wê ye. Gava 140 endam bi rêya desteyên nerasterast tên hilbijartin û 70 endamên din bi biryareke rasterast a serokomariyê tên tayînkirin, em ne li hemberî desthilateke qanûnsaz a ku ji sindoqan hatiye avakirin, lê li hemberî saziyeke ku bi biryareke “ji jor ve” hatiye avakirin in. Ev rê, prensîba “temsîlkirinê” ji naveroka xwe vala dike. Parlamento di bingehê xwe de, wekaletek e ku gel dide nûnerên xwe ye; wê hingê çawa dikare behsa wekaleta gel bê kirin, dema ku miwekîlê resen ji pêvajoya hilbijartinê dûr be û îradeya wî ji bo lîsteyên ku ji pêş ve hatine amadekirin, hatibe desteserkirin û tu mafê wan ji aliyê raspandinê (tefwîdkirin) ve nîn be? Ev tayînkirin wekî “berfirehkirina jêhatîbûnan û hewandina pêkhateyan propaganda jê re tê kirin. Lê dema ku em kûr li vê gavê binêrin, eşkere dibe ku ev ne hevkariyeke neteweyî ya rastîn e, lê bêtir proseyeke hewandina siyasî ye. Dema kursî wekî pareyên ji bo rûspî, akademîsyen û kesayetên opozisyonê yên berê tên belavkirin, parlemento ji meydana pêşbirkên siyasî yên azad vediguhere platformeke ji bo rêvebirina alîgiran û berfirehkirina bingehê piştgiriyê ya desthilata cîbicîkar. Pirsgirêka li vir, ne nasnameya kesên hatine hilbijartin e, lê xwezaya wî erkî ye ku ji wan re hatiye dayîn. Endamê ku bi biryara tayînkirinê yan bi rêya kanalên hilbijartinê yên sînordar hatiye, dê di rewşa xwezayî de deyndarê wî kesê ku ew hilbijartiye bimîne û dê ew nûneriya kolanê ku divê bike, neke.

Heta ew sembolên ku desthilatê ji bo xemilandina peyzajê bi kar anîne, mîna hebûna girtiyên berê yan zêdebûneke kêm di para jinan de, wekî hewldaneke eşkere ya ji bo nixumandina kêmasiya bingehîn a di rewatiya meclisê de xuya dikin. Nûneriya mexdûran bi danîna wan li ser kursiyên parlementoyê pêk nayê, lê bi dayîna desthilateke rastîn ji wan û yên mîna wan re pêk tê ku bikaribin hesabê rayedaran bixwazin û qanûnên dadmendiya veguhêz derxînin. Sembolîzma li vir, heta ku ev endam xwedî desthilateke rastîn nebin ji bo şikandina serdestiya cîbicîkar, dê di binê qubeyê de girtî bimîne. Em li hemberî dîmenekî ne ku tê de destûr tenê wekî perdeyekê ji bo derbaskirina siyasetên rewşa heyî xuya dike; desthilata ku sêyeka parlementoyê tayîn dike, ne li pey afirandina desthilateke qanìûnsaz a çavdêr e, lê li pey afirandina piştevaniyeke qanûnî ya mayînde ye ji bo biryarên xwe.

Encamên vê nebûna rewatiyê ji bo pêşeroja biryarên siyasî yên mezin wekî karesat xuya dikin. Meclîsa ku dê di 6’ê Tîrmehê de rûniştina xwe ya yekem veke, rûbirûyê kêşeyên giran dimîne; ji dosyayên dadmendiya veguhêz ên ku bi milyonan Sûriyeyî eleqedar dikin, heta gihandina çaksaziya destûrî ya berfireh. Lê belê, saziyeke ku bingehê gel jê re tunebe, çawa dikare li ser çarenûsa welat biryarê bide? Nebûna nûnertiya rastîn, bi taybetî li parêzgeha mîna Swêdayê û nîqaşên berfireh ên li ser nûnertiya hêzên siyasî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, tekez dikin ku ev meclîs ne piralîbûna rastîn a Sûriyeyê nîşan dide, lê nêrîna desthilata yekalî ya ji bo çareseriya siyasî radixe ber çavan.

Sûriyeyiyên îro, yên ku di salên şer de bacên giran dan, ferqa di navbera “saziyê” û “nûnertiyê” de baş dizanin. Tiştê ku em îro dibînin, avakirina saziyekê ye, lê ev avahiyeke wisa ye ku bingehê wê ya saxlem kêm e; ew bingehê ku her desthilateke qanûnsaz mafdar dike ku çavdêriyê bike û bibe dengê wan kesên ku tu dengê wan nîne. Ew “rewatiya destkeftiyê” ya ku desthilat hewl dide wê bifiroşe, têrê nake; dewlet bi tijekirina kursiyên vala nayê avakirin, lê bi rûniştandina pêvajoyeke siyasî ya ku li ser bingehê pêşbirkên azad, hilbijartinên rasterast û naskirina piralîbûna Sûriyeyiyan û daxwazên wan ên rastîn ên ji bo guhertinê hatiye damezrandin, tê avakirin.

Mirov dikare bibêje ku ev meclis li hemberî ezmûneke zehmet û çarenûssaz dimîne; yan divê ji astengên tayînkirinê rizgar bibe û bibe dengekî rastîn ê gel, yan jî dê wekî “çerçoveyeke destûrî” bimîne ku bêyî tu îtîraz, rewatiyê dide biryarên desthilata cîbicîkar. Nebûna hilbijartinên azad ên rasterast û pêşbirkên siyasî, vê parlementoyê dike rûyekî şikestî ku nikaribe rûbirûyê erkê qonaxa veguhêz bibe; ev yek jî derî ji gumanên gel li ser kêrhatina van rêyên siyasî yên ku bi temamî ji rastiyê û ji daxwazên Sûriyeyiyan ên ji bo avakirina dewleta maf û qanûnê ya ku ew xewna wê dibînin dûr in, vekirî dihêle. Rêya ber bi aramiyê ve, ne bi riya biryarnameyên tayînkirinê, lê di riya sindoqên dengdanê re derbas dibe.

# Xerîb Hiso: Yekîtiya netewî pêdiviyeke stratejîk û çarenûsî ye

**Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku niha di nav Kurdan de nakokiyên mezin tune ne, eger hebin jî pirsgirêkên biçûkin û bi rêya civînan tên çareserkirin, lê tiştê ku derdikeve pêş ku nîvê şandeya Kurdî ne bi îradeya xwe tevdigere û got, "Yekîtiya netewî pêdiviyeke stratîjîk û çarenûsî ye."**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê civîna dawî ya partiyên Kurd li Rojavayê Kurdistanê, xeteriyên li ser Kurdan û rêyên çareseriyê, Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Xerîb Hiso bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Di nava guhertin û veguhertinên heyî û bazarên navneteweyî de çi xeterî li ser Kurdan li çar parçeyên Kurdistanê taybet li ser Rojava heye?**

Li gorî rewşa ku niha li Rojhilata Navîn heye, aloziyek pir mezin derdikeve holê. Ev alozî tenê bi Rojhilata Navîn ve sînordar nîne, di asta cîhanê de ye. Lê navenda vî şer û aloziyê Rojhilata Navîn e. Dewletên hegemonîk dixwazin li gorî projeyên xwe Rojhilata Navîn birêxistin bikin. Ji bo vê armancê hemû rê û rêbazên şîdetê bikar tînin. Di aliyekî de dixwazin ser îradeya dewletan hikum bikin, di aliyê din de jî dest deyînin ser îradeya gelan. Di siyaseta dewletên hegemonîk û di projeyên wan ên li ser herêmê de, ev nakokî pirsgirêkek mezin derdixe pêş. Sedsala nû sedsala diyalog, aştî, demokrasî û qebûlkirina gelan e. Dema gelên Rojhilata Navîn dest bi Bihara Gelan kirin, ev bû peyamek mezin ji bo desthilatdarî û dewletên hegemonîk û ji bo di qonaxên nû de veguhêzbûn çêbibe. Weke civak dema ku dest bi vê Bihara Gelan kir, ji bo guhertinê amade bû. Lê zihniyeta desthilatdarî ne amade bû. Ji ber vê yekê alozî her ku diçe kûrtir dibe. Em vê rastiyê li gelek deverên Rojhilata Navîn dibînin, wekî li Sûriyê, Lubnanê, Îsraîlê, Filestînê, Iraqê û Îranê. Ji bo vê yekê pêdivî ye ku gel di nav xwe de lihevhatinên mezin ava bikin. Divê lihevhatina gelan û hevduqebûlkirin pêş bikeve. Ji wê zêdetir li hember şîdetê, siyaseta têkbirinê û înkarkirinê, em serî natewînin û tecrûbeyên vê jî heye, tecrûbeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ev tecrûbe zemînek ava kir, lê mixabin dewletên hegemonîk nahêlin ku zîhniyetek demokratîk û fikrek li ser bingehê çand were gel hevdu, dîrok were naskirin û ji nû ve were avakirin. Vê yekê qebûl nakin û li dijî wê êriş dikin. Di şexsê êrişa dewletan de, êrişî gelan jî dikin. Siyaseta ku niha tê meşandin wisa ye ku dosyaya çend dewletan di destê kesekî de ye. Mînak, Tom Barrack berpirsyarê dosyaya Sûriyê, Tirkiyê û Iraqê ye, dibe ku di demên pêş de bibe berpirsyarê dosyaya Îranê jî. Lê em divê ji bîr nekin ku di van çar dewletan de jî Kurd dijîn. Erdnîgarî û miletek heye, erdnîgariya Kurdistanê û gelê Kurd heye. Ev milet bi sedan salan zilm dîtiye. Qanûnek ku Kurdan biparêze tune ye. Her tim qanûnên ku derketine, qanûnên înkar, neqebûlkirin, têkbirina îradeya Kurd, darvekirin, komkujiyê û tesfiyekirinê bûne. Kurd her tim bi van qanûnan re rûbirû mane. Ev êrişên ku niha têne kirin jî li ser axa welatê me têne kirin. Di vê de dixwazin çi bikin? Gelê Kurd xweparast û li hember van hemûyan gotiye: "Ez heme, ez Kurdim, hebûnek min heye. Ez ne teror im, ez mafdar im." Kurdan bi fikrek nû pêşengî kiriye, îro ev pêşengiya wan li Rojhilata Navîn û li cîhanê diyar e.

Dîrokeke nû li Rojhilata Navîn tê avakirin. Li hember vê plan hene, planên ku bi siyasetên cuda di nav van çar dewletan de têne meşandin. Ji wan jî zêdetir, dewletên hegemonîk ên ku dixwazin li ser Rojhilata Navîn bandorê çêkin û bi van dewletan re têkildar in, bi taybetî Tirkiyê, Iraq, Sûriyê ger rêjîmên Baas dibe yan jî hikumeta demkî dibe û Îran, li dijî gelê Kurd ketine nav hewldan û tevgerek pir mezin. Ew naxwazin xwe ava bikin, lê dixwazin Kurdan têk bibin. Bi dewletên hegemonîk re dikevin nav hewldanên mezin da ku Kurdan bê çek, bê fikir, bê rêxistin û bê îrade bikin. Ji ber vê yekê rewşek aloz çêdibe û ji bo Kurdan gelek tengasî derdikeve holê. Kurdan tengav dikin, nahêlin ku bibin yek û werin cem hev. Kurdan bi teror û derxistina nakokiyan tewambar dikin. Herwiha Kurdan bi êrişên kom û giropên cihcuda ku hin ji wan bi ser Tirkiyê, hin bi dewletên Ereban û hin jî bi Îranê ve têne girêdan, tehdîd dikin. Ji ber vê yekê rewşa Kurdan dikeve nav tehlûke û xetereyekê de.

Kurd divê vê baş bixwînin. Di vê serdema nû de, ji bilî guhertinên ku di nav gelan de tên jiyîn, pêvajoyekî nû ya Rêber Apo dest pê kiriye. Ev pêvajo weke xetekê çareserî, diyalog û karê hevpar di Rojhilata Navîn de derdikeve pêş. Çi ji aliyê Kurdan ve be, çi ji aliyê pêkhateyên ku bi wan re dijîn, ev xeta demokrasiyê pir girîng e. Di vê xetê de şer û alozî tune ne, lê çareserî, biratî, maf û destûrên demokratîk hene. Rojhilata Navîn jî hewcedarê aştiyê, diyalogê û çareseriyên guncav e ku bi rê û rêbazên danûstandinê bêne bidestxistin. Lê mixabin siyasetên ku niha tên meşandin rê li pêşiya van hewcedariyan digirin. Di serî de gelê Kurd tê tehdîdkirin ku dijimin dibêje; Yan tê sîxortiyê ji min re bikî û li gorî ez dixwazim têv bigere, yan jî jiyan ji te re tune. Ev siyaseteke pir xeternak e. Em qebûl nakin ku tiştekî wisa li hember îradeya me bê kirin. Em tu carî îradeya xwe teslîmî van siyasetan nakin. Me gelek berxwedan kiriye, berdelên giran dayine û mafê me heye ku bi azadî bijîn. Mafê me divê were qebûlkirin û were naskirin. Xeteriyên pir mezin hene û hin hêzan naxwazin ku em vê sedsala nû bi azadî bijîn. Ji ber vê yekê divê helwesteke xurt hebe. Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê vê rastiyê hîs kirine ku siyaseteke taybet li hember wan heye. Ji ber vê yekê, wekî ku planên wan hene, divê planên me jî hebin.

**Girîngiya Yekîtiya Kurdî ji bo mafê Kurdan di destûra nû de were parastin çi ye?**

Niha em Kurd tim li ser destûrê meraq dikin, ji ber ku her welatek destûra xwe heye û em jî di van welatan de dijîn. Lê em di destûrên van welatan de tune ne. Heta ku em di destûrê de neyên naskirin, tu qanûn jî ji bo mafên me dernakeve, ne qanûna parastinê, ne qanûna hebûnê û ne jî qanûnek ku rê bide me ku em wek Kurd têkoşîna xwe ya demokratîk bikin. Ji ber vê yekê xebata me ya ji bo destûrê gelek girîng e û em di vê warî de hewldanek mezin dikin. Lê mixabin em di nav xwe de ne yekin. Siyaseta parçekirin û istîxlakê hîn jî li ser me tê bikaranîn. Ji ber vê yekê destûr bê yekîtiyê wateyeke mezin nade me. Ger em dixwazin di destûrê de bi mafên xwe re bên qebûlkirin, pêdivî ye ku em yekrêz û yekgirtî bin. Ev e sedema ku em li ser yekîtiyê gelek israr dikin. Yekîtiya me pir girîng e. Dema ku em yek bin û helwesta me yek be, eniya me ya hundir bihêz dibe, rêxistin çêdibe û aramî di nav Kurdan û herêmê de belav dibe, bawerî pêş dikeve û hêvî zêde dibe. Armanca yekîtiyê jî ev e.

**Piştî zêdetirî salekê ji Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî, şandeya hevbeş a Kurdî civîna xwe lidar xist, civîna çawa hate birêvebirin? Herwiha heya niha hikumeta demkî ji bo hevdîtinên bi şandeyê re çi bersivandiye û hewldan ji bo vê hevdîtinên çi ne?**

Civîn li ser daxwaz şandeya Kurdî beşê Partiyên Yekîtiya Netewî hat çêkirin. Civîn hevbeş bû û encamên wê baş bûn. Herwiha piştî konferansa 26'ê Nîsana 2025'an û avakirina şandeya hevbeş, ev civîna yekem bû. Di civînê de karê salekê hate nirxandin û nêrînên partiyan hatin guhdarkirin, hate diyarkirin jî ku di vê demê de di nav Kurdan de nakokiyên mezin tune ne, heke hene jî pirsgirêkên biçûkin û bi rêya civînan tên çareserkirin. Partiyên PYNK'ê xwestin ku ev civîn pêk were ku rewşa şandeyê gihiştiye ku de rê, ji ber wan fam kirin ku şande hîna li hev kom nabe pirsgirêk hene. Di warê medyayê de jî civîn hate ragihandin û nêrînên cuda hatin diyarkirin. Lê ji rexneyan zêdetir pêdivî bi çareseriyan heye, ji nakokiyan zêdetir jî, hatina cem hev û xebata hevbeş pêdivî ye. Herwiha di civînê de hate diyarkirin ku em konferansa 26'ê Nîsana borî diparêzin, ji ber ku bûyerek dîrokî bû û belgeyek dîrokî derxist holê. Lê tenê gotina ku ev şande neçûye Şamê têr nake. Ji ber ev şande ne tenê ji bo Şamê hatiye avakirin. Ji bo hemû Sûriyê, ev şande dikare bibe hêzeke girîng ji bo siberoja wê. Yekîtiya Kurdan dikare zemînek baş ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û nenavendî pêk bîne.

Mixabin şande xwe tenê li benda Şamê hişt û ji aliyê Şamê ve tu bersiv nehat. Bersiva ku hat jî tenê ji bo beşekî şandeyê hat şandin. Dema ku bersiv tenê ji bo beşekî şandeyê tê şandin, ev seqetandina şandeyê û yekîtiya Kurdî ye. Em bi îradeya gelê xwe û bi îradeya Kurdistanî yek bûne û hatine cem hev. Bi vê îradeyê jî em temsîlkarên doza Kurd li Rojava û Sûriyê ne. Lê dema ku hikumet an jî serokkomar tenê aliyekî şandeyê qebûl dike, ev çi wateyekê dide? Ev nîşana lîstikeke siyasî ye ku ew li hemberî Kurdan siyaset dikin û dixwazin şandeyê seqet bikin. Ji ber vê yekê diviyabû hevalên me yên di şandeyê de gotibana em bi tenê naçin, divê em bi hev re herin. Ev ne tenê di civînan de, lê di nav kolanên Kurdî de jî bûye mijara gotûbêjê. Lê tiştê ku derdikeve pêş ev e ku nîvê şandeyê ne bi îradeya xwe tevdigere. Biraderên ENKS'ê ne bi wê îradeyê ne ku bi şandeyê re hevdu temam bikin. Lewma em hêvî dikin em vê şandê bikin xwedî îrade. ENKS'ê nehate civînê, xwezî bihatana civînê da ku em bi hev re civîneke din lidar bixistin. Lê wan got ku ne amade û li Başûr in. Dîsa jî heger vegerin, derfet heye ku em bi hev re danûstandinan bidomînin.

**Gotina dawî**

Em weke PYD'ê û hemû partiyên siyasî yên ku em bi hev re têkildarin, derbarê rewşa yekîtiya netewî de em di axaftinê xwe de cedî ne û yekîtiya netewî tiştekî stratîjîk û çarenûsî dibînin. Lê mixabin biradarên ENKS'ê bi daxuyaniyaniyeke îsbat kir ku dîsa ji bo yekîtiyê ne amade ye û ji rastiya ku em Kurd tê re derbas dibin, xwe berpirsyar nabîne. Daxuyaniyeke wisa jî ne cihê çareserî ye, lê ew xetmandina kar û barên ku şandeya Kurdî bike ye, ev jî siyaseteke ne li gorî berjewendiya gelê Kurd e.

FENER



Idrîs Henan

## Nameya êrişên dawî navbera ezmûna ewlehî û veguherînên li herêmê çi ye?

Tabloya ewlekariyê li Sûriyê, paralelî pêşketinên bilez li herêmê û blokên nû tên avakirin, nîşaneyên destguherînên siyasî û ewlehî yên pabendî hewldanên statukûparêz û pêşbirka pozisyona hegemoniya global in. Qada Rojhilata Navîn motora vê guhertinê û navenda ku asyoa hegemoniya nû destnîşan dike ye.
Di heyamekî wisa de mirov nikare buyer û pêşketinên li Sûriyê ji rêzê bibîne. Rojane teqîn, êriş û li cihên ku maka terorê bûn, al û sembolên DAIŞ pir eşker derdikevin û li ser dîwaran nivîsên gefxwarin û sloganên intîqamê tên dîtin. Vizyoneke wisa xeternak ê ewlekariyê diyar dike ku Sûriyê li beramberî qonaxek cudayî hemû salên derbasbûyî ye. Êdî mesele ne tenê jimara qurbaniyan û asta wêraniyê ye, lê belê nameya siyasî û ewlehî ya van bûyeran e.
Dema ku cihekî sivîlan li navenda paytextê were hedefgirtin û teqînên ewqas mezin lê rû bidin, dêmekî hîna jî tevayî axa Sûriyê rûbirûyî metirsiyên mezin e û derewa ku dibêje; li Sûriyê aramî û ewlehî di gerantiyê de ye deşîfre dibe û welat carek din bi cilên hikumraniyeke nû ku pala xwe daye bingeha hişmendî ya heman rejîma tê îdiakirin ku qaşo hilweşiya ye li xala sifrê vedigere.
Pêşbirka nava komên radîkal ên xwedî paşxaneya selefî ne, vê realîteya nû li Sûriyê piştrast dike.
Êrişên tên kirin jî di cewherê xwe de xwedî nameya derûnî û medyayî ne ku armanc têkbirina baweriya civakê bi îmkan û şiyanên desthilata heyî ye. Ango; tu dikarî bibî desthilatdar û li rûpîvaneke mezin serwer bibî, lê tu nikarî ewlehiya civakê gerantî bikî!
Di heman wextê de; diyar dibe ku qonaxa nû ya piştî şerê navxweyî li Sûriyê, bi van rêbazên hikûmeta demkî ya rehîneyî hinek ecîndeyan e, nikare bibe nîşaneya bidawîbûna terorê li Sûriyê. Berovajî vê nerînê, xuya ye ku terorê li gorî qonaxê xwe ji nû ve rêxistin kiriye û rêbazên xwe li gorî pozisyona heyî nermtir û veşartî kirine. Bi gotinek din; insiyatîfa birêvebirina welat ji destê desthilata nû derketiye û heya roja îro nekariye hestên civakê bi aramî û ewlekariyê îqna bike. Ji ber vê jî, çendîn hewl bide xwe weke gerantorê aramiyê bide nîşandan ku ne ew be ewlehî li Sûriyê nîne, belavbûn û firehbûna cografîk ya terorê li Sûriyê nîşan dide ku tabloya heyî berovajî rastiya civakî û dewlemendiya çandî ye.
Ti şansê serkeftina projeyên biyanî li Sûriyê û herêmê nîne. Dema ku çareserî ji derve hatibe tivîkirin, wê çaxê ti wateya ewlehî û aramiyê jî nîne. Ji ber vê jî em dibînin ku êrişên pêk tên, him navend û xalên ewlekariyê û him jî navendên sivîl û saziyên dewletê hedef digirin. Yanê; êirşkar xwedî insiyatîf in û destê wan ê dirêj e. Ev jî rastiyek berovajî daxuyanî û hewldanên xwemaskekirinê ne. Bi gotinek din; di rewşek wisa kirîtîk ku herêm tê re derbas dibe de, destguhertinên li herêmê rû didin û hevpeymanên ji nû ve tên vesazkirin, liv û tevgera komên terorîst li herêmên di bin serweriya Hikûmeta Veguhêz de ne, diyar dikin ku; eger dosyayên siyasî, çandî, borî û ewlekarî li welat bi nêzîkatiyên cidî yên berjewendiya giştî dihewîne nava xwe neyên çareserkirin, wê çaxê yapiya aramiyê sist dibe, yekîtiya welat dikeve xeteriyê, dewlet lawaz dibe û kaxezên çareseriyê ji nû ve, li gorî berjewendiya hêzên destwerdanê tevlihev dibin.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Îsa Berwarî; Bejnek hunerî ya bilind û balyozê strana Kurdî li cîhanê

Hunermendên Kurd yên netewî roleke sereke lîstin di parastina nasname û zimanê Kurdî de û di parastina stranên folklorîk û kevneşopî ji têkçûn û jibîrkirinê, bi rêya stran, awaz û dengên xwe, êş û azarên gelê Kurd, hişmendiya wî ya neteweyî, hêvî û daxwazên wî bo azadiyê nîşan dan.
Hunermend Îsa Berwarî yek ji navdartirîn dengên ku xem û azarên gelê xwe hilgirtiye tê hesibandin û deng û hunera xwe ji bo xizmetkirina gelê xwe û doza wî û parastina ruhê strana folklorî ya Kurdî û gihandina mîrata stranbêjiyê ji nifşekî bo nifşê terxan kiriye.
Îsa Barwarî karîbû hunera kurdî ya resen bigihîne qadên navneteweyî, wî di muzîkê de penagehek û di awazê de welatek dît, da ku dengê wî bibe sembola nasname, azadî û afirîneriya kurdî.
Hunermend Îsa Husên Yûnis ku bi nasnav "Îsa Berwarî" tê naskirin, di sala 1933'an de li gundê Karefa girêdayî navçeya Amêdiyê ya bi ser parêzgeha Dihokê, ji dayîk û bavek Kurd, di nava malbateke welatparêz û kedkar de hatiye dinyayê, ku bi nirxên Kurdayetiyê û serbilindiya bi nasnameya neteweyî têr bûyî.
Ji zarokatiya xwe ve hezkiriyê huner û muzîka kurdî bû, ji ber ku di bin bandora xeml û bedewiya xwezaya rengîn a Kurdistanê û stranên mîrateyî yên kurdî de mabû, ji ber vê yekê, gewriya wî bi xweşiktirîn awazên folklorî di aheng û şehyanan de bilind dibû, nemaze di dawetan gundê xwe û gundên derdora wê de. Ew li jîngeheke kurdî ya gundewarî ku bi mîrateya devkî û stranbêjiyê dewlemend, mezin bûye, ku xwezaya çiyayî û stranên gelêrî yên ku bi dawet û bûyerên civakî ve girêdayî bûn, çarçoveya yekem a pêkhatina wî ya hunerî afirandin.
Bi lez û bez dengê wî li herêma Behdînan wek dengbêjekî gelerî yê ronakdar bi belav bû, wî ji kûrahiya dilê xwe stran digot, ku bi hestên mirovan û rengên jiyana wan a rojane têkil hev dikir.
Destpêka wî ya fermî li ser qada stranbêjiyê bi rêya radyoya kurdî di sala 1950'an de bû, ku li wir yekem stranê xwe bi navê "Şahîno" tomar kir; ew stran bi dengdanek berfireh hat pêşwazîkirin, dilê temaşevanan girt û hebûna wî ya hunerî ava kir.
Ji ber şert û mercên zehmet ên jiyanê û rewşa xerab a aborî ya malbata xwe, di sala 1957'an de tevî malbata xwe koçî bajarê Mûsilê dike û li wir derbasî cîhana huner û navdariyê dibe wî li wir hunermendê mezin Mihemed Arif Cezrawî nas kir, li ber destê wî perwer de bû û li gel wî di gelek konser û şevbuhêrkên stranan de amede bû, lewra wê qonaxê dibistanek hunerî ya girîng di kariyera wî de ava kir, ezmûna wî pêş xist û şêwazê wî yê taybet xurt kir.
Di wê qonaxê de, wî gelek stranên xwe di Radyoya Bexdayê de tomar kirin û bi riya radyoya Bexdayê - beşa kurdî, navdar bû, ku yek ji girîngtirîn platformên hunerî di wê serdemê de dihat hesibandin, wî tê de gelek stran pêşkêş kirin ku şopeke nemir di bîra civaka kurdî de hişt.
Ji stranên wî yên herî navdar: (De Xalo, Dunya, Emîna, Şimsî Xanê, Xirabo, Lawkê Deştanî, Delal, Xanmê) û gelek parçeyên din ên muzîkî jî hene ku ruhê mîrata kurdî nîşan didin û gelek nifşên dengbêjan jê îlham girtine.
Di wê demê de, nav û dengê wî di nav kurdên başûrê Kurdistan de belav bû, bi rewah û şêwazê xwe yê taybetî di pêşkêşkirina stranên ku ji mîrata gelêrî têne girtin, wek:
(Emê Kozê, Xec û Siyamend, Çeto, Landik, Zembîl Firoş).
Hêjayî gotinê ye ku piraniya stranên wî ji gotin û awazên wî bûn ku ev yek jî hişmendiya wî ya hunerî û şiyana wî ya afirîneriya hevgirtî nîşan dide.
Ji nav navdartirîn stranên ku bi dengê wî yê xweş hatin gotin:
(Esmerê, Seyanê, Cîranê, Canê, Berf Barî, Gênc Xelîl, Lalî Xanê, Delal, Navê Te, Xweş Eqîdo, Şahîno....).
Di sala 1970 ê de, nav û dengê wî sînorên Îraq û başûrê Kurdistanê derbas kir, bû hunermendekî afirîner û navdar ku di astek berfireh de tê naskirin û nûnerek berçav ê strana Kurdî ya resen li derveyî jîngeha xwe ya herêmî.
Di sala 1973'an de tevî hunermend Mihemed Arif Cezrawî û hunermend Gulbuhar çû Lubnanê û li wir çend aheng û konsertên serketî li dar xistin ku bala temaşevanan kişandin, û rolek girîng di xurtkirina hebûna stranên kurdî li derveyî welatê xwe de lîstin.
Di sala 1975'an de,wek serokê beşa mûzîk û stranbêjiya kurdî li radyoya Bexda (Beşê kurdî ) hat erkdarkirin û yekemîn koma muzîkê ya ji endamên ciwan ava kir, ku tê de cureyên stran û muzîka kurdî pêşkêş dikirin.
Herwiha beşdarî gelek festîvalên hunerî li hundir û derveyê Iraqê, başûrê Kurdistanê bû û çendîn stran û sirûdên netewî ji bo radyo û televizyonê tomar kirin.
Di sala 1978'an de ji bo ku bibe balyozê stran û hunera Kurdî çû Ewropayê, li Brîtanyayê li ser sehneyên London, Birmingham û Walesê konsertên stranbêjiyê pêşkêş kirin, piştre li Fransayê konsertên serkeftî li Parîs û bajarên din ên Fransa li dar xistin û bi beşdariya gelek kurd û Iraqiyan. Herwiha li Avusturya jî bi tevlîbûna hunermend Gulbuhar û koma muzîka kurdî konsertên hunerî li dar xistin û li Viyana û Lînzê bernameyên taybet û berbiçav pêşkêş kirin.
Îsa Berwarî di heyama karê xwe yê hunerî de gelek xelat û rêzdayîn ji Wezareta Çand û Ragihandinê ya wê demê ya Îraqî wergirtin, herwiha, şaredarê Paris jî madalyaya zêrîn da wî wekî rêzgirtinek ji bo xebat û hewldanên wî yên di naskirina hunera kurdî ya resen , li nav gelê fransî , û di xurtkirina hebûna wê li nav civakên çandî yên navneteweyî de.
Hunermend Îsa Berwarî ligel hejmareke mezin ji hunermendên navdar ên Kurd re jiyaye û bi wan re ezmûnên dewlemend di(stranên hevpar) duetanên stranbêjiyê de derbas kiriye , ku di dewlemendkirina dîmena hunerî ya kurdî de rolek girîng lîstin ,ji nav wan:(Mihemed Arif Cezrawî, Gulbuhar, Tehsîn Taha, Mihemed Teyîb Tahir, Nisrîn Şêrwanî, Ebdo Elanê, Eyşe Şan, Erdewan Zaxoyî, Salih Amîdî û yên din).



Bi vî awayî ,Îsa Berwarî dengekî nemir ma û di rewaha û şêwaza xwe de di navbera resenîya mîrata gelêrî, ruhê hunera neteweyî û kûrahîya hestên kurdî de hevahengiyek pêk anî û li pey xwe mîrateyek muzîkî ya xurt di bîra strana kurdî de hişt, ku bibe yek ji sembolên wê û çirayek ku di rêwîtiya wê ya çandî û hunerî de navemire.
Ji bo Îsa Berwarî, strana netewî ne tenê derbirîneke hestyarî ya derbazbûyî bû, lê hişmendiyek kûr a hunerî ya neteweyî bû, hişt ku ew stranê weke amûreke parastina nasname û berxwedanê li hember jibîrkirinê binirxîne, dengê wî giraniya dozê û rastiya girêdanbûnê hilgirtibû, di navbera hêsaniya awaz û kûrahiya peyamê de hevsengiyek afirîner çêdikir bû.
Bi girêdana stranên xwe yên bi ax, welat û azadiyê re,wî roleke girîng lehîst di xurtkirina strana netewî ya Kurdî weke parçeyekî bingehîn ji bîreweriya çandî ya civakê , lewra dengê wî bû pira girêdana mîrata kevneşopî û peyama neteweyî û belgeyeke hunerî ya ku piştrast dike ku hunera Kurdî dengê gel, nasnameya netewe û banga azadiyê ye.
Îsa Berwarî ne tenê hunermendek an stranbêjek bû, lê belê bestekar, nivîskar û muzîkjenek hevgirtî bû.
Ew yek ji stûnên strana kurdî ya kevneşopî ye û xwediyê dibistaneke hunerî ya taybet bû , ku ji aliyê resenî û kûrahî ve dihate nasîn û ev şêwaz alîkar bû di xurtkirina taybetmendiyên stranbêjiyê kurdî û parastina ruhê wê di nav nifşan de.
Ji çavkaniyên wî yên hunerî yên xweşav gelek hunermendên Kurdistan jê vexwartine , û ji ruhê strana kevneşopî ya kurdî û gewhera hunera resen a kurdî îlhama girtine ,lewra stran, awaz û şêwazê wan dewlemend kirine, ji ber vê yekê dibistana hunerî ya Îsa Berwarî wek lêvegerek zindî ji bo nifşên pêşerojê bimîne.
Îsa Berwarî dengekî dilsoz ê welatê xwe ma, xem, bîr û nasnameya gelê Kurd di awazên xwe de hilgirt, strana wî ne şehyanek hunerî bû, lê helwest û girêdanek bû, ku bi wê yekê ziman û mîrata xwe parast û muzîk kir welatek, û stran kir bîranînek zindî ku nayê venamirandin , da ku peyama wî ya hunerî di wijdanê nifşan de zindî bimîne.
Hunermendê Kurd Îsa Berwarî di 1'ê Tebaxa 2002'an de li bajarê Dihokê di şêst û neh saliya xwe de koça dawî kir, Cenazeya wî li Dihokê bi merasîmeke bi heybet hate veşartin , bi beşdarbûna hezkir û hevrêyên wî, tevî ku rewşa ewlehiyê rê li ber beşdarbûna gelek hunermendan girt.
Piştî 12 salan, di sala 2014'an de, mala wî li Mûsilê rastî êrîşa rêxistina terorîst a DAIŞê hat, ku tê de pirtûk, kaset û tomarên wî hatin şewitandin, û milkê wî hat talankirin, ev bûyêr giraniya kêşeyên mezin ên ku mîrata hunerî ya kurdî rast tê, diyar dike û û tekezî li ser giringiya parastina mîrateya hunermendên ku bi dengê xwe û çanda xwe peyama gelê kurd hilgirtine di nav nifşan de.
Bi çûyîna wî, gelê kurd yek ji stûnên sereke yên strana kevneşopî ya resen, û dengek ku giyan û pakiya strana folklorîk parastiye ji têkçûn û jibîrkirinê winda kir.
Îsa Berwarî ne tenê pêşkêşkarekê stran û awazanbû, lê belê ew parêzvanê bîra stranbêjiyê ya kurdî bû, wî mîrata kevneşopî veguhaste nifşan bêyî ku resenîya wê winda bike, da ku mîrateya wî bibe şahidek li ser nemirîya hunera resen di nav dilê gelê kurd de.
Îsa Berwarî mîrateyek hunerî ya dewlemend li pişt xwe hişt ku di nav xwe de bi sedan stranên folklorî, kevneşopî û neteweyî digire, bi vê mîrateyê, wî berhemên muzîkî yên kurdî dewlemend kir û hebûna stranê ya resen di bîra çandî de xurt kir, wek beşek bingehîn ji nasname û hesta kurdî.
Îsa Berwarî dê her dem di bîra tevahî gelê kurd de zindî bimîne, wek dengek ku rayê xwe di wijdana wî ya çandî de berda be, û bibe çiraxek ji bo nifşên pêşerojê di parastina resenîya stranên kurdî û ruhê hunera kurdî de, wek mîrateyek zindî ku bi demê re kêm nabe û bandora wê qet namire.
Ji bo ruhê wî yê pak rûmet û mandarî û ji bo afirînerî û mîrateya wî ya hunerî mayînde û domarî.



Remezan Olçen

## Şoreşa Edebiyata Komunal

Ji bo ku em nebên "em nikarin tiştên nû bixwînin", serîhildana herî mezin vegera li çîrokên xwe, li zimanê xwe û li pirtûkxaneyên xwe ye ku bêhna azadiyê jê tê.
Gava em qala vegera li pirtûkxaneyan dikin, em behsa kirîn û firotineke ji rêzê ya li bazarê nakin. Berovajî vê, weşanxaneyên kurdî îro mîna kargehên hişmendî û hişyariyê lazim e kar bikin.
Di bin şert û mercên giran ên aborî û polîtîkayên qedexekirinê de, her pirtûka ku tê çapkirin, li hemberî vê jiyana mekanîk mîna mertaleke rûmetê ye. Lê belê, ev mertal tenê dema ku digihîje destê xwendevan û di mejiyê civakê de dibe ramanek, hingê zindî dibe û wateya xwe dibîne.
Ji ber vê yekê, çalakiyên weşanxaneyan ên li bajarên wekî Amed, Qamişlo, Hewlêr, Wanê û herwisa li sirgûnê, li Ewropayê, lazim e, ne tenê şevbuhêrkên îmzekirina pirtûkan re sînordar be. Ev çalakî gav bi gav divê veguherin meclîsên nîqaşê û qadên parvekirinê. Gava weşanxaneyek li kolanekê an jî li baxçeyekî maseya xwe datîne, ew sîstema kapîtalîst a ku çand û hunerê tenê ji bo çend kesên dewlemend rewa dibîne, parçe dike. Edebiyata ku ji çavkaniya paradîgmaya demokratîk û ekolojîk feyz digire, divê xwe bigihîne her taxê, her gundî, û her malê.
Yek ji dermanên herî xurt ên li dijî nexweşiya biyanîbûnê (dûrbûna ji cewherê xwe) ku neolîberalîzmê xistiye nav dilê civakê, rûbirûbûna rastîn û zindî ye. Sîstema modern her kesî li pey ekranên sar ên telefon û kompûteran asê kiriye û mirov kirine otomatên ku tenê li gorî fermanên pergalê tevdigerin. Hevdîtinên nivîskar û xwendevanan ku li pirtûkxane û navendên çandê tên lidarxistin, vê qeşayê dişkênin û germiyeke mirovî ava dikin.
Gava nivîskarekî/ê kurd û xwendevanek li dora heman maseyê li çavên hev dinêrin, li wir têkiliyeke sar a "hilberîner û xercker" ava nabe. Xwendevan li wir ne tenê guhdarekî pasîf e; ew bi pirsên xwe, bi rexneyên xwe û bi parvekirina êş û bendewariyên xwe, dibe şirîkê çîroka nû. Ev hevdîtin dibin qadên xwebûnê. Li wir, li ser romana ku behsa berxwedana jinê ya li vî welatî dike, an jî li ser helbesteke ku hawara xwezayê tîne zimên, nîqaşên kûr û rastîn tên kirin. Ev ne tenê axaftina li ser edebiyatê ye; ev bi hev re hûnandin û xêzkirina asoyên paşerojê ye.
Ji ber hindê jî lazim e, pirtûkxaneyên me êdî ji bêdengiya pirtûkên tozgirtî derkevin; ew bibin cihên ku dengê azadiyê, ramanê û nîqaşên civakî tê de bilind dibe. Gotûbêjên ku bi kurmancî tên kirin, ziman ji çarçoveya akademîk a sar derdixin û dixin nav herikîna germ a jiyana rojanê ya di nav gel de. Nivîskarên xwedî ezmûn û civaka ku dixwîne, di van çalakiyan de tên cem hev, bîra çandî radestî hev dikin û nahêlin ku ev zincîr biqete.
Di vê qada berxwedanê de, cihê herî stratejîk û xurt ê şoreşa edebî di destê jinê de ye. Paradigmaya azadîxwaziya jinê, di edebiyata kurdî de ne tenê wekî babetekî ji rêzê, lê wekî rêbaza ramanê û avakirina ziman bixwe cih digire. Jinên nivîskar û xwendevan, bi tevlîbûna xwe ya xurt a di van çalakî û hevdîtinan de, hişmendiya pederşahî a kapîtalîzmê hildiweşînin. Ew çîroka ku zilaman bi sedsalan e li ser navê wan nivîsandiye, vê carê ji nû ve û bi zimanê xwe yê resen û azad dinivîsin.
Li hemberî sîstema neolîberal a ku her tiştî û her kesî dike "otomat", sîstema alternatîf a ku gelê kurd pêşkêşî mirovahiyê bike, bi hêza edebiyatê re dibe xwedî can û giyan. Em banga hîn bêhtir piştgirî, hîn bêhtir xwedîderketina li weşanxane, pirtûkxane û çalakiyên wêjeyî dikin.
Heta ku em pirtûkên xwe bi vî zimanî bixwînin, li kûçe û pirtûkxaneyên xwe bi hev re li ser jiyanê nîqaş bikin û çîrokên xwe ji destê hovîtî û talana kapîtalîzmê rizgar bikin, tu sîstem nikare me bike makîne. Çand, huner û edebiyat, çekên me yên herî mezin ên afirandina wateyê ne. Lazim em vê wateyê li qadan, bi piştgiriya hev, bi domdarî û bi kurdî mezin bikin.

# Cotkarên ku zeviyên wan şewitîne banga qerebokirinê dikin

Cotkarên ji gundê Gir Sor yê girêdayî bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku ji ber şewata zeviyên wan, zerareke madî ya mezin gihaşt wan û gotin, "Zevî şewitîn û me zerareke pir mezin dît. Pêwîst e em bên qerebokirin."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Demsala çandiniya îsal ne wekî salên berê bû ku bi hişkesaliyê derbas dibû. Îsal ji ber barana zêde ku bariya demsaleke çandiniyê ya bi xêr bi xwe re anî, ev yek hişt ku hêviyên cotkaran jî ji nû ve çêbibe, lê ji ber bûyreyên agir ku di demên dawî de bi gelek zeviyan û rûberên fireh yên erdên çandiniyê ket, hêviyên van cotkaran hilwişiya, di nava van erdan de li gundê Gir Sor yê girêdayî gundewarê Qamişlo nesîbê xwe ji agir jî bir, ku di encama pêketina agir bi zeviyan derdora 400 çewal ji berhemên ku hatin çandin şewitîn, ev berhem derbara sereke ya zêdetirî 20 malbatên ku di gunde dijîn, bû.

**Agir bû sedema windahiyên mezin bo cotkaran**

Derbarê vê mijarê de cotkarê bi navê Elî Îbrahîm ku ji gundi Gir Sor e ji rojnameya me re tekez kir ku ji ber agirê ku bi erdê wan ket windahiyên mezin bo wî û çend cotkarên din ji gund bi xwe re anî, herwiha diyar kir ku rûbera erdê wî tenê gihaştibû 150 donimî û piraniya wê ji ber agir şewitî.

Elî Îbrahîm behsa lêçûna çandiniya îsal kir û wiha anî ziman: "Lêçûna çandiniyê ji kirîna tovan û gubreyê gîhaşt 2 hezar û 500 dolarê Amerîkî. Min erd ji xwediyekî erd kirê kir, lê hemû lêçûna çandiniyê ji tov, gubre û pêwistiyên helberînê li ser min e, ji xwe qezenca ku ji dawiya çandinê bihata wê di navbera min û xwediyê erd de ba. Şewata ne tenê gîhaşt erdê min, lê rûbereke mezin ji gundê me hat şewitandin, ez texmîn dikim ku derdora 400 çewal ji zeviyên çanidniyê hat winda kirin, agirê ku bi erdê me ket, wextî gihaştba cihên din, lê bi hewldanên gundiyan rê li ber belavbûna wê hat girtin."

Elî Îbrahîm kêmbûna îmkanên ji bo bûyerên rûdana agiran rexne kir û wiha got: "Tevî meznahiya agir û berfirehbûna wê, tenê sarîceke agirkujê hebû, sarîca agirkujê neçar dima ku bi awayekî dubare biçe avê dagire û vegere, vê yekê hişt ku agir belav bibe û bibe sedema zirarê. Divê sê an çar sarîcên agikujê ji bo rûdana agir bên dabîn kirin."

Elî Îbrahîm îşaret kir ku tenê ji erdê wî 20 donim maye, tevî zirara madî ya ku gihaşt cotkar wê qezenca vê rûberê mayî bide xwediyê erd,



Elî Îbrahîm



Fener Xalid

ji ber ew dibîne ku xwediyê erd bi awayekî mezin zirar dîtiye û ji mafê wî ku ji zeviyê mayî sûd bigre û wiha gotina xwe qedand: "Aliyên peywendîdar ji kesên ku erdê wan şewitiye daxwaz kirin ku navê xwe li Navenda Îrşada Çanidniyê tomar bikin, da ku tezmînatê bidin wan, lê heya niha cewherê tezmînatê û mekanîzmaya dayîna wê nehatiye zelalkirin."

**Daxwazên xizmetguarî ji bo rûdana agir**

Ji aliyê xwe ve cotkarê bi navê Fener Xalid ew jî ji heman gundî ye destnîşan kir ku windahî û zirareke mezin gîhaşt wî û wiha anî ziman: "Rûbera erdê ku min çandibû gihaştibû 300 donimî, lê agir hemû zevî şewitandin. Di heman demê de lêçûna çandiniyê di desmsala heyî de pir bilind bû, ne tenê di kirîna tovan de, lê belê di kirîna gubre, dermanên çandiniyê û pêwistiyên hilberînê jî. Min nêzî 5 hezar dolarê Amerîkî lêçûn da, herwiha erdê ku min çandiniye ne yê min e, lê min ji kesekî din kirê kiriye, ji xwe hemû lêçûna çandiniyê li ser min e û qezenca di dawiya demsalê de bi nêvî ye."

Fener Xalid destnîşan kir ku demsla îsal baş bû, lê agir bû sedema windahiya hemû zeviyê wî, îşaret kir ku agir ji deraseyekê ku dema dixebitî derket û di encamê de bi awayekî lez di nava zeviyan de belav bû di heman demê de derengbûna gihaştina cihê agir rexne kir û wiha got: "Ji ber kêmbûna çavkaniyên berdest agir bi lez belav dibû. Li cihê qezayê ji ber şok û dûmanê pirsgirêkek giran a tenduristiyê bi min re çêbû û neçar mam ku bi alîkariya hin gundiyan xwe bighînim nexweşxaneyê, gerek ambolansên tenduristiyê di van bûyeran de jî amade be. Di heman demê de jî yek ji gundiyan dema ku beşdarî vemirandina agir bûye şewitiye û ji ber şert û mercên dijwar û berfirehbûna dûmanê ew nikarîbû kesekî bibîne ku tavilê alîkariya wî bike."

Fener Xalid diyar kir ku aliyên peywendîdar ji kesên zirardar xwestine ku navên xwe, rûbera erdên ku bandor bûne û navên xwediyên wan tomar bikin. Lêbelê, hûrguliyên tezmînatê û mekanîzmaya dayîna wê hîn nehatine zelalkirin. Herwiha tekez kir ku cotkar li benda piştgiriyek rastîn in da ku beşek ji windahiyên xwe tezmîn bikin û daxwaz kir ku rêjeya tezmînatê ne kêmî ji sedî 75 be.

Fener Xalid wiha avaftinên xwe qedand: "Em dixwzin ku di demsala çinînê hazirtiyên awarte û ambulansê li herêmên çandiniyê xurt be herwiha sotemniyê ji me dabîn bikin. Kantona Cizîrê bi awayekî sereke xwe dispêre çandiniyê, pêdiviya vê yek jî bi parastineke xurtir bo cotkaran û zeviyên wan heye."

# Li taxa Hilêliyê gel bi xwe dest bi paqijiya taxê dikin

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Endamê Meclisa Taxa Hilêliyê Reed Mihemed diyar kir projeya wan a hilgirtina barê paqijiyê û komkirina çopê di nava taxa wan de, wê bi destekdayîna gel bi ser bikeve û got; "Em hêvî dikin ku projeya me bibe mînak ji her meclis û komînên bajarê Qamişlo."**

Meclisa Taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo pêşîniyarek bi armanca baştirkirina paqijiya taxê û komkirina çopê pêşkêşî şaredariya Gel a Bajarê Qmaişlo kiribû. Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ev pilan qebûl kir û ji bo serkeftina vê pilanê hazirtiya xwe diyar kir. Meclisa Hilêliyê çar komîn girêdayî wê ne (Şehîd Serhed, Şehîd Sebirî, Şehîd Orhan û Şehîd Hebûn). Di taxa Hilêliyê de zêdetirî 5 hezar malbat û firoşgeh hene. Di heman demê de avahiya serke ya Zanîngeha Rojava cihê wê li vê taxê dikeve, wekî din 5 dibistan in. Herwiha tax ji du beşan pêk tê: Hilêliya Jorîn û ya Banî.

Ji bo ku agahiyên zêde li ser vê mijarê bigrin dest, endamê meclisa Hilêliyê Reed Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Endamê Meclisa Hilêliyê Reed Mihemed di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku projeya wan wekî alîkarî û piştgiriya şaredariyê di aliyê paqijiyê de ye û wiha berdewam kir: "Di Qamişlo de nêzî milyonek kes lê dijî, ji bilî cihêrengiya pêkahteyan û çandên wan yên cuda herwiha koçberên di encama kirîza Sûriyê de ku tê de bi cih bûn, di vir de hilbet dê barê paqijiya barjêr zehmet be û bi kêmasî û pirsgirêkên mezin rû bi rû bimîne, ji ber vê yekê wekî meclisa taxa Hilêliyê me projeya hilgirtina karê paqijiyê pêşkêş kir, ev yek piştî ku me dît valahiyeke di vî warî de derket holê, di heman demê de gelek komkirên çopê di nava taxê de zêde bûn."

**'Şaredariyê haziritiya pêşkêşkirina alîkariyê da me'**

Reed Mihemd wiha anî ziman: "Di destpêkê de me proje pêşîniyarî şaredariyê kir, me nîqaş kir, piştre hat erêkirin û ji hêla xwe ve şaredariyê hazirtiya pêkêşkirina alîkariyê ji bo dabînkirina pêwistiyan diyar kir. Bi vê yekê barê paqijiyê û komkirina çopê me hibigirt li ser milê xwe herwiha bi alîkariya şêniyên taxê, bi vê yekê em ê karîbin barê şaredariyê sivik bikin, ji ber ku karê ku dikeve ser milê şaredariyê pir zehmet e bi taybet di vê rewşa ku em tê de derbas dibin. Wekî her kes dizane jî karê çopê pir giran e."

**Dabînkirina alav û erebeyên barkirina çopê**

Reed Mihemd diyar kir ku ji bo pêkanîna projeyê şaredariyê alavên paqijiyê ji wan re dabîn kir û wiha berdewam kir: "Da ku em projeyê pêk bînin, şaredariyê ji me re alav û erbeyên paqijiyê dabîn kir, lê wekî sîstem ji bo şopandina kar û xebatan dikeve ser milê meclisê. Niha 4 terektor gel me ne herwiha me daxwaza bendozerekê kir ji bo hin komirên çopê yê kevin jî rakin. Komîteyek ji pênc kesan pêk tê, hat ava kirin, ji xwe ev komîteyê dê li ser şopandin û sîtema projeyê raweste. Hejamara karmendên paqijiyê 16 ne her çar karmend ji bo terektrekê dixebitin û karê paqijiyê dikin. Lê niha tenê 4 karmendên taxê di nava xebatên paqijiyê de ne û yên din ji ber demsala çinînên ne li ser karê xwe ne, ji bo ku ev ne be pirsgirêk, şaredariyê ji hêla xwe ve karmend dabînkirin ji bo ku valahî çênebe û dê dema karmendên din vegerin wê dest bi xebatên xwe bikin."

**'Bi destekdayîna gelê dê ev proje biserbikeve'**

Reed Mihemed di axaftina xwe de banga destekdayîna gel kir ji bo serkeftina projeyê û wiha got: "Em bi gelê xwe bawerin, ji ber ku dema gel bi me re bin wê projeya me biser bikeve. Ji xwe taxa Hilêliyê taxeke mezin û firehe, tê de zêdetirî 5 hezar malbat jiyan dikin. Em hêvî dikin ku gelê me jî alîkariyê bi me re bikin û dengê xwe bide me heya ku em vê projeya xwe pêşbixin û piştî rakirina komirên çopê yên kevin em ê sîstemek nû jê re deynin. Niha rewşa paqijiyê ji berê baştir bûye. DI pilanên me de yên bê de, em ê bernameyekê ji bo pêşxistina çanda paqijiyê di nava gel de pêş bixin, ev yek jî di rêya dayîna semîneran di nava komînan de, wê pêk bê."

**'Rojane kar û xebatê paqijiyê tê kirin'**

Endamê Meclisa taxa Hilêliyê Reed Mihemed di dawî de wiha anî ziman: "Rojane kar û xebatên paqijiyê li taxê tê kirin, pirsgirêk û astengiya ku em êşê jê dikşînin ew e ku cihê avêtina çopê li Girê Reş e û ev cih



pir dûr e, herwiha terektorên bakirina çopê carekê tenê diçe û bi seatn dimînin heya ku çopê vala dikin ev jî pirsgirêkek din e. Ji hin astengiyên din jî ku em pê re rû bi rû dimînin, kevnbûna alavên paqijiyê ye û ji ber çûn û hatina rêyên dûr pir xirabûn tê de çêdibe. Ji bo ku ev proje pêş bikeve jî çi xirabûna di alav û erebeyên paqijiyê de derkeve şaredariyê ev bar hilgirt ser xwe, di heman demê de dabînkirina mazot û zeytê jî ji hêla şaredariyê tê dabînkirin. Heya Rêya serke a Hîzamê û ji çerxerêya Yûsifê Gulo heya çerxerêya Osman Sebirî jî girêdayî me ne û em bi karê paqijiya wê dikin. Em hêvî dikin ku projeya me destpê kiriye li Hilêliyê bibe mînak ji her meclis û komînên bajarê Qamişlo, ev yek jî ne bi hêsanî ye, lê dibe ku proje demeke dirjê bikeve heya biser bikeve."



# 'Divê statuya zimanê Kurdî were misogerkirin'

Hevserokê Enstîtuya Kurdî ya Amedê û endamê Komîteya amadekar ya Konferansa Zimanê Kurdî Mirad Bîlgîç diyar kir ku li Tirkiyê li hemberî 75 hezar dibistan, 200 zanîngeh û gelek saziyên fermî, tenê 30 saziyên zimanî ji bo parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî dixebitin, lewma Konferansa Zimanê Kurdî ji bo dîtina çareseriyên nû, pêşxistina perwerdehiyê û misogerkirina statuya zimanê Kurdî hate lidarxistin.

**Ronaz Silêman**

Ziman li gel her mirovekî xwedî girîngiyeke taybet e, her mirovek dixwaze bi zimanê xwe hîn bibe. Lê mixabin gelek gel û netew ji ber siyasetên yekrengî zimanê wan li ser wan hatiye qedexekirin, gelê Kurd jî yek ji van gelan e ku siyaseta asmîlasyonê li ser tê meşandin, lê ew bi têkoşînê hebûn û zimanê xwe didomînin, herwiha rêya misogerkirinê ji xwe re bingeh girtiye. Di heman demê de di nava pêvajoya aştiyê de ku li Bakurê kurdistanê tê meşandin, hewldana bidestxistina statuya zimanê Kurdî tê kirin. Herî dawî jî girîdayî zimanê Kurdî Konferansa Zimanê Kurdî li Amedê hate lidarxistin.

Girêdayî lidarxistina Konferansa Zimanê Kurdî, herwiha siyaseta dewletê ya ku li hemberî zimanê Kurdî dide meşandin siyaseteke çawa ye û divê niha bi çi awayî zimanê Kurdî li Tirkiyê were misogerkirin, hevserokê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ku endamê Komîta amadekar ya Konferansa Zimanê Kurdî bû Mirad Bîlgîç ji rojnameya me re axivî.

Mirad Bîlgîç eşkere kir ku Konferansa Zimanê Kurdî ya dawî di sala 2012'an de pêk hatibû û wiha got: "Konferansa Zimanê Kurdî ya dawî li Bakurê Kurdistanê di sala 2012'an de pêk hatibû. Piştî wê konferansê pêvajoyeke aştiyê dest pê kir, lê paşê ev pêvajo têk çû. Di wê demê de li Tirkiyê di warê siyasî de guherîn çêbûn, zextên dewletê zêde bûn û gelek sazî û dezgehên Kurdî hatin girtin. Gelek girtin, binçavkirin û şehîdkirinên hevalên me pêk hatin. Di qada zimanî de û di nav hemû sazî û dezgehan de bi tevahî girtin an jî belavbûnek rû da. Her çend di salên dawî de ji nû ve komkirin, rêxistinbûn û geşkirina xebatên Kurdî hebûbe jî, lê mixabin şert û mercên îro ne wekî salên 2000'an in. Em niha bi dîrok, nêrîn, siyaset û tekneolojiyek nû re rû bi rû ne. Ji bilî vê gelek guherînên civakî, pergalî û hişmendî jî rû dane. Ji ber vê yekê her çiqasî bi polîtîka û stratîjiyên kevin kedeke mezin hatibe dayîn jî, encamên ku hatine bidestxistin têrê nekirin. Lewma ji bo mayendekirin, misogerkirin û domandina zimanê Kurdî, pêdivî bi polîtîka û stratîjiyên nûjen heye ku bikarin bersiva van pirsgirêkan bidin. Di heman demê de pêdivî hebû ku em ji bo mayendekirina zimanê xwe rêbaz û planên nû pêş bixin, ji bo vê armancê ev konferans hate lidarxistin."



**'Rewşa zimanê Kurdî li Bakurê Kurdistanê hatiye asta xeteriyê'**

Bîlgîç di dewamkirina axaftina xwe de bal kişand li ser rewşa ziman û ev axaftin anî ziman: "Mixabin li Bakurê Kurdistanê di warê zimanî de, taybetî di deh salên dawî de, rewşeke nebaş heye û ev rewş her ku diçe berfirehtir dibe. Ev rewş gihîştiye asteke xeterê. Ji ber vê yekê pêdivî bi hin biryarên radîkal heye, hem jî pêdivî bi biryarên ku hem berpirsiyariyê li ser me, li ser derdora Kurdewarî, li ser sazî û dezgehên zimanî û kesên têkildar bar bikin, hem jî rêya me ji bo pêşerojê ronî bikin, heye. Herwiha pêdivî bi çarçoveyeke muzakere û danûstendinê jî hebû, çarçoveyek ku hem ji bo axaftin û muzakereyê bi dewletê re bingehek biafirîne û hem jî rêveçûna me diyar bike. Ji ber vê yekê, ev ne tenê konferanseke navxweyî ye, lê konferanseke ku rê û rêbaza me ya derve jî diyar dike, ji bo wê konferans xwedî girîngiyeke taybet bû."

**'6 mehan amadekariyên Konferansa Zimanê Kurdî hate kirin'**

Bîlgîç li ser amadekariyên ku ji konferansê re hatin kirin axivî û wiha bilêv kir: "Nêzîkî 6 mehanan amadekariyên vê konferansê berdewam kirin. Armanca me ew bû ku ji bo birîna li ser zimanê me heye dermanek bibînin. Ji ber vê yekê me bi 6 mehanan xebat û amadekariyên berdewam kirin û di 27 û 28'ê Hezîranê de li Amedê bi dirûşmeya "Ji statuyê heta perwerdehiyê, ji bo muzakereyê çarçoveyeke nû", Konferansa Zimanê Kurdî ya ji bo Bakurê Kurdistanê û hemû Tirkiyê pêk anîn. Konferans du roj dewam kir û bi 7 rûniştinan û 19 panelîstan hat meşandin. Di konferansê de gelek mijarên girêdayî statuya zimanê Kurdî, perwerdehiya bi zimanê dayikî, mayendekirina ziman û domdariya wê hatin nîqaşkirin. Nûnerên qadên hiqûqê, perwerdehiyê, çapemeniyê, çandê û gelek beşên din ên têkildar beşdar bûn û li ser awayên pêşxistina zimanê Kurdî fikir û pêşniyarên xwe parve kirin. Konferans bi beşdarbûna 500 delegan û gelek mêvanan bi awayekî geş û xurt pêk hat. Ji xwe rast e ku konferans ji bo muzakereyê jî hate lidarxistin û armanca wê ew bû ku ji bo muzakereyê çarçoveyeke nû biafirîne. Lê di heman demê de ev konferans bersivek bû ji bo pêdiviyeke ku salan xwe li me ferz dikir. Em bawer in ku polîtîkayên heyî nikarin vê rewşê bidin rawestandin û êdî ji gazincan wêdetir hewcedariya gavên nû hebû. Her çend xebat pir in, lê encamên ku heta niha hatine bidestxistin nekarîne pêşiya asîmîlasyona heyî bigirin. Ji ber vê yekê em vê konferansê wekî qonaxek dîrokî dibînin. Hêvîya me ew e ku encamên wê ji hêviyên me jî wêdetir bibin û bibin çavkaniya jiyaneke nû ji bo zimanê Kurdî. Em biryar da ku ev konferans ne tenê bûyerek demkurt be, lê bibe şewq û hêzek ji bo mayendekirina zimanê Kurdî. Xebatên me bi konferansê re neqediyan, berevajî wê konferans destpêkek bû. Ji niha û pê ve hemû kes û derdorên Kurd dikarin bi xebatên hevbeş pêşiya asîmîlasyonê bigirin û ji bo pêşxistina zimanê Kurdî gavên nû bavêjin. Em dikarin bêjin ku ev rêwîtiya nû hê dest pê kiriye."

**'Statuya ziman çareserî ye'**

Bîlgîç tekez kir ku divê ziman xwedî statuyek fermî be û wiha pê de çû: "Ji bo misogerkirina zimanekî di şertên îroyîn de, ji statuyê pêştir tu çareserî tune ye. Divê ziman xwedî statuyek fermî be. Zimanek ku statuya wî tune be, her dem bi xeteriya tunebûnê re rû bi rû dimîne. Dibe ku bi hin xebatên civakî û demokratîk ev xeterî bi demkî kêm bibe, lê ev yek ji bo mayendebûn û misogerkirina zimanê têra xwe nake. Ji ber vê yekê îro rêya herî girîng ji bo mayendebûn û domdariya zimanan "statuya ziman" e. Em jî têkoşîna statuya ziman li ser vê bingehê dimeşînin. Herwiha bi statuya ziman re divê perwerdehiya zimanê Kurdî jî di nav wê statuyê de cih bigire. Derveyî vê rêyê em nikarin bêjin ku birîna me dê were dermankirin. Di warê gavên pêwîst de jî di mekazagona heyî ya Tirkiyê de zimanê fermî tenê Tirkî ye û zimanên din nayên nasîn. Lê zimanê min Kurdî ye, zimanê civaka min Kurdî ye û gelek zimanên din jî li Tirkiyê dijîn, ev rewş li pêşiya gelek pêşveçûnan dibe asteng. Perwerdehiya fermî ji bilî Tirkî nayê dayîn, sazî û dezgehên ku dixwazin bi şert û derfetên xwe perwerdehiyê bi zimanên din pêk bînin, tên girtin an jî cezakirin. Wateya vê yekê ew e ku di hêla zagonî de gelek qanûn hene ku hem li pêşiya xebatên Kurdî yên taybet û fermî astengî çêdikin, hem jî rê nadin ku rêveberiyên herêmî an xwecihî di vê warê de gavên pêwîst bavêjin. Ji ber vê yekê em di vê pêvajoyê de dixwazin van qanûnan bi awayekî sererast bikin."

**'30 saziyên zimanî karê parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî dikin'**

Bîlgîç li ser geşbûna xebatên zimanê Kurdî û astengiyên salê dawî ev yek anî ziman: "Li Bakurê Kurdistanê piştî salên 1990'î xebatên Kurdî yên ji bo parastin, pêşxistin û pêvebirina zimanê Kurdî gelek pêş ketin. Wek ku tê zanîn gelek sazî û dezgehên ku vê erkê li ser milê xwe girtibûn hatin avakirin. Piştî salên 2000'an ev geşbûn hîn berfirehtir bû. Bi taybetî bi avabûna Enstîtuya Kurdî ya Stenbol û Amedê, Kurdî-Der û Tevgera Zimanê Kurdî, gelek sazî û dezgehên din jî hatin damezrandin. Lê mixabin di sala 2016'an de hemû sazî û dezgehên ku vê xebatê dimeşandin hatin girtin. Li wan cezayên cuda hatin birîn, arşîvên wan hatin talankirin, amûr û alavên ku bi wan kar dikirin hatin desteserkirin, di heman demê de kesên ku van xebatan dimeşandin hatin girtin û li dijî wan doz hatin vekirin. Bi vî awayî gelek astengiyên mezin derketin holê. Lê gelê Kurd gelekî berxwedêr e, ji nû ve sazî û dezgehên xwe ava kirin, bîr û arşîvên xwe kom kirin. Rast e ku arşîvên me gelek hatibûn talankirin, lê her tiştê ku peyda bû, xebat li ser wê ji nû ve hate destpêkirin. Niha jî mixabin li hemberî 75 hezar dibistanên Tirkiyê, 200 zanîngeh û gelek sazî û dezgehên fermî yên wek wezaretan, tenê nêzîkî 30 saziyên zimanî karê parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî li ser milê xwe digirin. Lê ev tenê têrê nakê. Lewra yek ji armancên bingehîn ên vê konferansê jî ev bû ku parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî tenê ne karê saziyên zimanî ye, bi tenê 30 saziyan ev tişt ne pêkan e û ne jî gengaz e, ev kar karê hemû saziyên û dezgehên ku xwe wek saziyên civaka demokratîk pênase dikin e. Ev karkek neteweyî û hebûnî ye. Ji ber vê yekê lidarxistina vê konferansê ji me re erk û ferz bû. Niha piştî konferansê em hêvî dikin ku hemû sazî û dezgeh bibin hevkarên parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî. Divê xebat berdewam bike û belavbûna heyî hêdî hêdî ji holê rabe. Li ser vê bingehê konferans tenê bû derfeteke ku em berpirsyariyên xwe diyar bikin û rêyeke hevpar nîşan bidin. Ji vir û pê ve xebatên nû dest pê dikin, em dikarin kêmasiyên xwe bibînin, wan temam bikin û bi israr dewam bikin."

**'Zimanê Kurdî pîvaneke welatparêziyê ye'**

Mirad Bîlgîç axaftina xwe wiha qedand: "Gelek biryar û pêşniyar di konferansê de hatin girtin. Niha li ser encamnameyê tê xebitandin. Lê di nav biryarên ku berî derketina encamnameyê ji bo me girîng bûn de biryara ku dibêje zimanê Kurdî pîvaneke welatparêziyê ye, ev biryar ji bo me gelek girîng bû. Beşdar bi dilxwazî tevlî bûn û bi ciddiyet li ser van biryaran rawestiyan. Xebatên ku dê bêne kirin divê tenê wek xebatên dezgehên zimanî neyên dîtin, divê hemû dezgeh û saziyên civakî beşdarî van xebatan bibin. Biryarên din ên bi vî rengî jî hene."



# Siyamend Mûînî: Çarenûsa gelên bindest bi hev ve girêdayî ye

Endamê Konseya Serokatiyê ya PJAK'ê Siyamend Mûînî diyar kir ku rêjîma Îranê piştî şerên dawî di qeyraneke kûr a aborî û siyasî de ye, divê gelê Îranê fêm bikin ku çarenûsa gelên bindest bi hev ve girêdayî ye û ew ê bikarbin bi hev re di civakeke azad û demokratîk de jiyanek bi rûmet bijîn.

**Şaho Xanim**

Di derbarê rewşa dawî ya Rojhilatê Kurdistan û Îranê, endamê Konseya Serokatiyê ya PJAK'ê Siyamend Mûînî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Piştî êrişên Amerîka-Îsraîl yên dawî li ser Îranê, hûn rewşa navxweyî ya Rojhilatê Kurdistan û Îranê çawa dinirxînin?**

Piştî du şerên Îranê bi Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê re, rewş guheriye. Desthilatdarên Îranê hewl didin ku xwe bihêz nîşan bidin, di heman demê de piraniya rêberên wan ên navdar hatine kuştin, ji xwe ew komek sûcdar in ku rasterast û nerasterast di kuştina mirovan de yek bi yek beşdar bûne. Rejîm wekî sîstemek teokratîk dihat birêvebirin û wan xwe wekî nûnerên Xwedê dihesibandin, ji ber vê yekê wan rewatiya ku bi her awayî bixwazin bi gel re tevbigerin, dan meşandin.
Niha, ji bo wan, ew rewatî winda bûye. Îranê qet li ser çareserkirina pirsgirêkên gelan nefikiriye û di hişê pergalê de jî tune ye ku van pirsgirêkan çareser bike. Ev sîstem rejîmek despotîk û dîktatorî ye û tenê li ser mayîna vê sîstemê û berfirehkirin û xurtkirina teknolojiya şer difikire, ji ber vê yekê gelek budce ji bo bidestxistina çekên neoklerî veqetand û niha jî mûşekên wê yên balîstîk ên bihêz hene. Îsraîl êrîşî Îranê kir û di 24 saetên pêşîn ên êrîşê de beşek girîng ji fermandarên payebilind ên Îranê hedef girt û gelek ji wan kuştin, ku ji bo Îranê pir dijwar bû û derbeyek xurt li avahiya artêşa wê bû.
Piştî van şeran, rêjîma Îranê bi sedan çalakvanên siyasî û sivîl li Kurdistanê girtine, gelek kes îdam kirine û bi hezaran ciwan li kolanan qetil kirine. Hinceta Îranê ew e ku ew sîxurên Îsraîlê ne. Bi taybetî ji bo tirsandina Kurd, Belûç û Ereban da ku ew nefikirin ku li dijî dîktatorî û neheqiyê xwepêşandanê bikin.

**-Piştî êrişên Amrîka û Îsraîl, Rejîma Îranê di warê aborî û siyasî de di nav krîzeke kûr de ye; gelo ev krîz dikare bibe sedema guhertineke an hilweşîna rejîmê?**

Piştî şerên bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê re, ambargoya aborî ya li ser Îranê dijwartir bû, rewşa aborî ya Îranê xirabtir bû û heke ambargo berdewam bike, Îran dê nikaribe mûçeyên gel û hêzên leşkerî bide. Niha gel êdî dikare li gorî berjewendiya xwe biryar bide. Em dizanin ku piştî kuştina Xameneyî û hin berpirsên din ên girîng ên rejîmê, merceya an navenda ku Xameneyî bû winda bû û niha rêjîm hewl dide kurê wî Mocteba wê navndê bigire û birêve bibe û xwepêşandanan bi dawî bîne. Niha bi êrîşa li ser Kurdistanê, dibe ku rêjîma Îranê dixwaze plana xerab a fetwaya Xumeynî ya 28ê Tîrmehê dubare bikin. Rêjîm di kirîzeke kûr deye û dixwaze bi dabeşkirina civakê desthilata xwe bi rêve bibe.




**-Polîtîkayên zext, sîdar û girtinê yên ku rejîm li dijî çalakvanên Kurd, Belûç û azadîxwazan dimeşîne, bandorek çawa li ser berxwedana civakê dike?**


Bi xwezayî, gel azadî û ewlehiyê dixwaze û heke rejîmek ji vî mafî wan bêpar bike, ew ê bi berxwedanê re rû bi rû bimînin. Ji dema ku rejîm hatiye ser desthilatê, hewl daye ku pirsgirêkên civakê bi zext û darvekirinê çareser bike. Zêdetirî 47 salan e ku rejîmê dev ji kuştin û girtina gel bernedaye û tu têgihîştina çareserkirina pirsgirêkên gel tune. Wekî ku hûn dizanin, rejîm bi komkujiya gelê Tirkmen li Sahraya Tirkmen dest pê kir. Piştî wê Xumeynî fetwa li dijî gelê Kurd da. Gelek kes hatin kuştin û koçber bûn. Bi hezaran ciwan, sosyalîst û şoreşger di zindanan de hatin darvekirin. Ji bo rejîmê, ne girîng e ku gel ji kîjan neteweyê ne. Ew li siyaset û civakê ji perspektîfa faşîzma olî dinêre. Ji ber vê yekê, hemû neteweyên wekî Belûç, Ereb, Kurd û civakên din amade ne ku li dijî vê rejîmê li eniyek hevpar şer bikin û ev yekane çareserî ye ji bo bidestxistina pergalek cûda ji vê hikûmeta dîktator. Niha Îran bi alîkariya Tirkiyeyê plan dike ku Kurdan û vê mijarê di rojeva siyasî ya herêmê de bitepisîne û ev ne tenê Rojhilatê Kurdistanê lê hemû beşên Kurdistanê digire nav xwe.

**-Weke PJAK, model û projeya ji bo paşeroja Îranê û Rojhilatê Kurdistanê çi ye?**

PJAK li ser bingeha xwerêxistinkirin û pêşxistinê dixebite, di heman demê de ew di qada sîyasî ya Kurdistan û Rojhilatê Kurdistanê de bi berdewamî çalak dimîne. Siyaseta me li ser bingeha xurtikirina têkilî û nêzîkbûna bi neteweyên din ên li erdnîgariya Îranê re ye wek Belûç, Ereb, Azerî, Gilek, Talîş, Maznî û Tirkmen. Pêwîste em têkilîyên xwe bi hêzên demokratîk re xurt bikin û di warê sîyasî de ji bo avakirina civatek demokratîk li Îranê hevkariyê bikin. Em, wekî PJAK, di çarçoveya konfederasyona demokratîk de projeya xwerêveberiya demokratîk dipijrînin. Em ji bo vê ramanê têdikoşin û amade ne ku di çarçoveya rastiya sîyasî de alternatîfên cûda binirxînin.

**-Têkiliya PJAK'ê bi partiyên din ên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê di çi astê de ye?**

Bi salan e PJAK hewl dide ku partîyên sîyasî yên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bike yek û li heman eniyê ji bo azadîyê têbikoşe. Niha şeş partîyên li Rojhilatê Kurdistanê hevpeymanîyek ava kirine û em hêvî dikin ku ev hevpeymanî berdewam bike û xurttir bibe. Divê hevpeymanî di pratîkê de gavên wêrektir bavêje û wekî yek hêz ji bo azadiya Kurdan li dijî rejîma dîktator û şovenîzma navendî, têkoşînê bide meşandin.



**-Bangawaziya we ji bo hêzên opozîsyona Îranê yên Fars, Azerî û Belûç çi ye?**

Divê ew rewşa dîrokî ya hesas ku tê de dijîn fam bikin, derfet û xetereyan binirxînin û fêm bikin ku çarenûsa gelên bindest bi hev ve girêdayî ye û em dikarin bi hev re di civatek azad û demokratîk de jiyanek bi rûmet bijîn. Ji ber vê yekê, divê em pêşwaziya pêşerojek demokratîk bikin, wekî din dîrok dê ji bo van miletan dubare bibe, xetereyên asîmîlasyonê dê firehtir bibin û derfet ji bo dîktatorên kirêgir dê vebin.

**-Felsefeya "Jin, Jiyan, Azadî" ku ji Kurdistanê derket û li seranserî Îranê belav bû, îro di civaka Rojhilat de di çi astê de ye û rola KJAR'ê di vê pêvajoyê de çi ye?**

Şoreşa jin, jiyan û azadî li ser felsefeyekê hatiye avakirin ku pêşengiya jin û ciwanan dike. Şoreşa Jin, Jiyan û Azadî ne tenê li Kurdistanê, lê di heman demê de li Îranê û heta li herêmê jî ronesansek rewşenbîrî afirand. Ew destpêka qonaxek nû bû di felsefeya jin, jiyan û azadiyê de. KJAR jî wekî rêxistinek pêşeng û modern dikare vê mîsyona dîrokî li Kurdistanê bimeşîne û em dibînin ku ew xwedî kapasîteya teorîk e ku vê tevgera mezin a dîrokî bi kar bîne û birêve bibe.



# Diyardeya xwekuştinê; Sedem û rêyên pêşîlêgirtinê

Xwekuştin diyardeyeke civakî û derûnî ya herî bi êş û metirsîdar e. Sedemên sereke yên vê diyardeyê nexweşiyên derûnî, kêşeyên aborî, zextên civakî, pirsgirêkên malbatî û şerên demdirêj in ku dibin sedema bêhêvîtiyê.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Xwekuştin yek ji diyardeyên civakî yên herî bi êş e. Ji ber ku valahiyek di peywendiyên civakî, kesayetî, aborî, siyasî û exlaqî de diafirîne û ev valahî bandora neyînî heta dawiyê li civakê dike.
Li gorî amarên fermî yên saziyên navneteweyî di salên dawî de, diyardeya xwekuştinê û hewldanên xwekuştinê bi awayekî berbiçav zêde bûye, bi taybet di nava jin û ciwanan de. Raporên navneteweyî destnîşan dikin ku xwekuştin ne bi welatekî an komeke temenî ya taybetî ve girêdayî ye, lê dikare di hawîrdor û çandên cûda de, wekî encamek têkiliya gelek faktorên psîkolojîk, civakî, aborî û tenduristiyê, çêbibe.

**Bîlanço xeteriyê didin xuyakirin**

Li gorî daneyên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, her sal li çaraliyê cîhanê zêdetirî 720 hezar kes bi xwe dikujin, ku ev yek di her deqeyekê de bi qasî yek mirinê ye. Texmîn her wiha destnîşan dikin ku hejmara hewldanên xwekuştinê ji hejmara rastîn a mirinan pir zêdetir e, ji bo her mirinê zêdetirî bîst hewldanên nekujer hene. Herwiha bîlanço nîşan didin ku xwekuştin bi qasî ji sedî yek hemî mirinan li çaraliyê cîhanê pêk tîne û di nav sedemên sereke yên mirinê de di nav ciwanan de ye, wekî sêyemîn sedema sereke ya mirinê ji bo kesên di navbera 15 û 29 salî de tê hesibandin. Beşek girîng a van mirinan li welatên kêm dahat û navîn çêdibin, ku pir caran di peydakirina karûbarên tenduristiya derûnî û piştgiriya civakî de bi pirsgirêkan re rû bi rû dimînin.
Xwekuştin kêm caran encama sedemek yekane ye, berevajî vê, ew encama tevliheviyên a çend faktoran e. Nexweşiyên tenduristiya derûnî, bi taybetî depresyon, nexweşiyên fikarê û nexweşiya duqutbî, di nav faktorên herî berbiçav de ne ku bi zêdebûna xetera xwekuştinê ve girêdayî ne. Zextên aborî jî roleke girîng dilîzin, wek bêkarî, xizanî, kombûna deynan û windakirina dahatê, nemaze di dema krîzên aborî de. Pirsgirêkên malbatî, şîdeta navmalî, çewisandin, tecrîda civakî û windakirina kesekî hezkirî jî dikarin hin kesan ber bi bêhêvîtiyê ve bibin. Faktorên din ên ku îhtîmala xwekuştinê zêde dikin ev in, îstismara alkohûl û madeyên hişber, nexweşiyên kronîk an êşa domdar û rûbirûbûna bi şer, karesatan an koçberiya bi zorê, şert û mercên ku dikarin bandorek giran li ser tenduristiya derûnî bikin.
Her çend xwekuştin dikare di her temenî de çêbibe jî, ciwan di nav komên herî zêde bandordar de ne. Mezinên pîr ên ku tenêtî an nexweşiyên kronîk dijîn jî di xetereya zêdetir de ne. Lêkolîn nîşan didin ku li gelek welatan rêjeya xwekuştinê ya mêran bilindtir e, di heman demê de hewldanên xwekuştinê yên nekujer dibe ku di nav jinan de li hin civakan de pirtir bin. Lêbelê, ev şêwaz li gorî faktorên çandî û civakî û hebûna lênihêrîna tenduristiyê diguherin.
Li gorî daneyên herî dawî yên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê diyardeya xekuştinê li hin welatên cîhanê di nava salekê de wiha ne: Li Hindistanê zêdetirî 170 hezar kes, Çîn di navbera 120 heta 130 hezar kes, Amerîka 49 hezar kes, Rûsya 25-35 hezar kes, Japonya 20 hezar kes, Başûrê Kûriya 13-14 hezar kes, Almanya 10 hezar û Ferensa 9 hezar kes. Li gorî texmînên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, navîna ya cîhanî salane ji 720 hezarî zêdetir bûyerên xwekuştinê çêdibin, an jî ji her 100 mirinan yek li çaraliyê cîhanê ye.

**Bandorên civakî û aborî**

Bandorên xwekuştinê ji windakirina jiyanê wêdetir dirêj dibin. Ew bandorên kûr ên psîkolojîk li ser endamên malbatê, heval û hevkarên xwe dihewînin û dikarin bibin sedema pirsgirêkên demdirêj ên wekî xemgîniyê û pirsgirêkên tenduristiya derûnî ji bo kesên nêzîkî wan.



Welat di heman demê de barên aborî yên ku ji ber windakirina kedê, lêçûnên lênihêrîna tenduristiyê, pêvajoyên qanûnî û windakirina hilberînê çêdibin hildigirin. Ev yek istismarê li pêşîlêgirtina xwekuştinê hem mirovî û hem jî aborî dike.
Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê pêşniyar dike ku kêmkirina xwekuştinê pêdivî bi komek tedbîrên berfireh heye, di nav de berfirehkirina xizmetên tenduristiya derûnî, perwerdekirina pisporên tenduristiyê ji bo destnîşankirina kesên di xetereyê de, xurtkirina bernameyên hişyariya civakê, kêmkirina gihîştina rêbazên xwekuştinê dema ku gengaz be û baştirkirina piştgiriya psîkolojîk di dema krîz û karesatan de. Teşwîqkirina kesan ji bo axaftina li ser hestên xwe û lêgerîna piştgiriyê ji malbat, heval an pisporan jî dikare jiyanan xilas bike, ji ber ku destwerdana zû pir caran faktorek girîng di pêşîlêgirtinê de ye.
Xwekuştin hîn jî pirsgirêkek cîhanî ye ku hevkariya di navbera hikûmetan, saziyên tenduristî, perwerde û medyayê, her wiha civaka sivîl de hewce dike. Li pişt her bilançoyekê çîroka kesek, malbatek û civatek heye ku ji windahiyek bi êş bandor bûye. Ev yek pêşîlêgirtina xwekuştinê dike berpirsiyariyek hevpar ku hişyariyê zêde dike, xurtkirina karûbarên tenduristiya derûnî û avakirina jîngehên piştgirî û hevgirtîtir hewce dike. Ev rapor li ser texmînên herî dawî yên ku ji hêla Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê ve hatine weşandin hatiye çêkirin, ku nîşan didin ku salane zêdetirî 720,000 kes li çaraliyê cîhanê bi xwekuştinê dimirin. Xwekuştin sedemek sereke ya mirinê di nav ciwanan de ye û tê tekez kirin ku pêşîlêgirtin bi destwerdanên tenduristî û civakê yên bi bandor gengaz e.

# Gundê Kelhê

**Berçem Silêman/ Dêrik**

**Kelhê yek ji gundên kevnar yên bajarê Dêrikê ye û bi gundê koçeran tê naskirin, li gorî zanyariyan ew di navbera salên 1920 û 1930'î de hatiye avakirin û niha nêzî 80 malî li gund hene.**

**Jiyana Gundan**

Jiyana gundan şêwazekî jiyanê yê yekgirtî ye ku bi temamî li ser bingeha girêdanbûna bi xweza, ax û ajalan re ava dibe û pergala wê ya aborî û civakî ji ya bajaran gelekî cûda ye. Ev jiyan bi giranî li ser bingeha çandinî û ajaldariyê dimeşe, ku cotkar di demsalên cûda de genim, ceh, zeytûn an fistiqan diçînin û ji bo dabîna xwarin û dahat malbatê jî heywanan xwedî dikin. Di vê navberê de, rola jinê di zindîmayîna jiyana gund de pir bingehîn e, ji ber ku jin ne tenê di karên malê û çêkirina nanê tenûrê de, lê di heman demê de li nava zeviyan, di dema doşandina sewalan û berhevkirina berheman de jî mil bi milê mêran kedeke bêhempa didin.



Her wiha gundên koçeran hertim xwedî taybetmendiyeke cûdaye ji ber ku jin xwedî roleke serekeye.

**Dîroka avabûna gundê Kelhê**

Ji ber ku gundê Kelhê ji aliyê civakî ve gundekî koçerî ye, dîroka avabûna wî ne wekî bajar an qesrayên dîrokî bi rojek an saleke fermî ya diyarkirî dest pê dike. Lê li gorî zanyariyên devkî, dîrokî û çavkaniyên herêmî yên devera koçerata gundê Kelhê di navbera salên 1920'an heta 1930'î hêdî hêdî ber bi gundbûnê ve çûye, sala 1941'an bi awayekî fermî bûye gund. Piştî hilweşîna Împeratoriya Osmanî û xêzkirina tixûbê fermî di navbera Sûriye û Tirkiyeyê de koçerên herêmê êdî nekarîbûn bi rehetî her sal herin zozanên Serhedê. Ji ber vê yekê, wan dest pê kir ku li deverên xwe yên germiyanê xaniyên ji herî û keviran ava bikin û bi cih bibin.

**Parastina mîrsa koçerî**

Gundê Kelhê dikeve Başûrê Çiyayê Qereçox, nêzî tixûbê Başûrê Kurdistanê û herêma Şingalê dikeve. Kelhê gundekî xurû kurd e, şêniyên gund ji êla koçerên Mîran, Kiça, Şerabî, Cibîrî, Teya, Abasî, Xerza û Alika ne. Jin û mêrên gund heta îro parastina cil û bergên folklor ên koçeriyê dikin. Hunera Dengbêjiyê û gotina stranên gelêrî yên koçerî di nav jiyana wan a rojane de cihekî pir mezin digire. Gundê Kelhê yek ji wan deveran e ku kaniyên petrol û gazê lê hene û di aboriya herêmê de xwedî cihekî stratejîk e. Ji ber ku bingeha gund ji niştecîbûna malbatên koçer pêk tê ku berê di konan de dijiyan û paşê bi cih bûn, hejmara malan di asta gundekî navîn de ye derdora 50 heta 80 malî tê texmînkirin, lê di dema berê de hijmaran wan gihişt 200 malî, lê piraniya wan berê xwe dan paytexta Şamê da ku debara jiyanê bikin. Piraniya malbatan ji eynî êlê ne û pewendiyên wan ên xizmtiyê pir xurt in.

**Jiyana Aborî**

Di dema berê de piraniya gundiyan bi sewalan re mijûl dibûn û kesê di gund de dema pezê wan neban, malbatên xwedê pez bi wan re dibûn alîkar di biharan de çend pezê xwe didan wan da ku debara jiyana xwe bikin. Jiyana aborî ya gund li ser du stûnên sereke ava bûye; Xwedîkirina Sewalan ji ber ku koka wan koçer e, şivantî û xwedîkirina pez karê wan ê sereke ye ku pê debara xwe dikin firotina şîr, mast, penêr û hwd. Çandiniya Bejî: Di deşta berdar a devera Dêrikê de çandiniya genim, ceh û nîskan dikirin. Jiyaneke sade, xwezayî û bi hevkarî birêve diçe. Jin di karên malê, çêkirina berhemên şîr û çandiniyê de mil bi milê mêran re dixebitin.
Di dema berê de dema şahiyek di gund de çêdibû bavê zava li malên gund digeriya û ji gundiyan re digot ku ez ê kurê xwe bizewicînim û gundî jî pê re dibûn alîkar her yek li gor derfetên heyî pez didanê de, yê ku pezê wî neban yan çiwalên genim yan pere didanê piraniya dawetê li ser gundiyan bûn ji ber ku rihê komînal zêde bû, lê niha bi demê re ev yek winda bûye, lê tevî hemû şert û mercên heyî gundên koçeran hewil didin xwedî li çanda xwe derdikevin û wê ji tunebûnê diparêzin.